



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdi Miqdad Mûhed Bedirxan

Armanî

Hejmar, No: 146
Çileyê Paşîn-Sibat
January-February 1994
Buha - Price
15 SKR, 3 DM

Rojnameya Mehane

Berî hilbijartina meheli terora dewletê li dijî DEP'ê

DEP hilbijartinê boykot dike

Bi nêzîkbûna hilbijartina meheli terora dewletê ya li dijî DEP'ê ber fireh dibe. Avahiyên DEP'ê tînen bombekirin, berpirsiyar û endamên wê tînen kuştin û birîndar kirin. Di derheqê namzetên belediyan yê DEP'ê de mahkeme tînen vekirin.

Bi nêzîkbûna hilbijartina meheli dewlet bi hêzên xwe yê tarî li dijî DEP'ê şerê berfireh dike. Di 18'ê Sibata de merkeza DEP'ê ya Anqerê hat bombekirin. Bi navê Ekrem Akçaya kesek hat kuştin û 17 kes jî birîndar bûn. Li ser bombekirina merkeza DEP'ê Serokê DEP'ê Hatip Dicle got ku "ev ji aliyê hukmetê ve hatiye plankirin û ji aliyê Kontrgerilla jî hatiye tetbîqkirin." Li ser vê bûyerê gelek rêxistin û komeleyên demokratîk û kutlewî û platforma kovar û rojnameyên Kurd û Tirk ên pêşverû beyan derxistin û vekişîna rûş kirin. Serokkomarê Tirkîyê Suleyman Demirel û Serokê SHP'ê û cigirê Serokwezîr



û serokê Belediya Licê Nazmî Balkaç ji wezîfê hat stendin.

Çendekî berê DEP'ê daxwaz ji Parlamentoya Ewropayê kiribû ku di dema hilbijartina de heyeteke çavdêr bişîne Tirkîyê da ku hilbijartinê di ciyê xwe de tefîş bike. Ev daxwaz ji aliyê Parlamentoya Ewropayê ve hatibû qebûl kirin. Li ser vê meselê Tirkîyê gelek aciz bûbû û Serokê Meclîsa Tirkîyê Husametîn Cîndoruk bi nameyêke gazinên xwe ji Parlamentoya Ewropayê kir. Dema ku Husametîn Cîndoruk nameya gazinan ji Parlamentoya Ewropayê re dişand, avahiya merkezi ya DEP'ê ya Anqerê jî dihat bombekirin. Hatip Dicle got "ev bombekirin bersîva qerara Parlamentoya Ewropayê ye û dewlet mesûlê vî tiştî ye."


Yekbûn Info jî di hejmara xwe ya 5'an de bi kurtî li ser hilbijartinê wiha dibêje: "Tirsa dewletê ew bû

Dûmahîk: r.11


Mûrad Karayalçin bombekirina DEP'ê bi beyanan rûş kirin.

Di 5'ê Sibata de jî Sekreterê DEP'ê Mûrad Bozlak li Anqerê hatibû birîndarkirin. Namzetên DEP'ê yê belediyan tînen girtin û tehdît kirin. Avahiyên DEP'ê yê Mamak û Yenişehir (Anqerê) û Dêrikê çendekî berê hatin gulebaran kirin û gelek xesar hat dayin. Serokê Belediyên Licê, Çolemergê û Xezoyê jî ber ku ketin DEP'ê derheqê wan de mahkeme hat vekirin

Ji nivîskarên Kurdan re cezayên hefsê



Osman Aytar 24 meh cezayê hefsê û 100 milyon cezayê pere



A. Zeki Okçuoglu 20 meh cezayê hefsê 41 milyon cezayê pere


Dewleta Tirk bi hemû dezhegên xwe li hember tîkoşîna netewî û demokratîk ya gelê Kurd seferber bûye. Bi bahana şerê li dijî PKK'ê dewlet bi tank û topên xwe, balafir û helikopterên xwe gund û qezayên Kurdistanê wêran dike, xelkê mecbûrê surgunê dike û bi navê cinayetên "qesasnediyar" herroj bi dehan welatparêz û rorakbîrên Kurd tînen kuştin. Êdî li Kurdistanê mafê jiyane jî ji navê rabûye. Rojnamevan û kovar û nivîskar û ronakbîrên Kurd hedefa dewletê ne.

Kesên ku li dijî terora dewletê disekin, tînen kuştin, cezakirin û hepiskirin. Dewlet di van mehên dawiyê de li dijî Kurdan wisa hov bûye ku êdî tehamûlî dîtin û fikran jî nake. Kesên ku li ser rastiya Kurd û Kurdistanê dîtinên xwe dinivîsin tînen cezakirin, rojname û kovar û kitêbên ku Kurd derdixin tînen civandin û Mahkema Bilind jî tavilê van cezayan tesdîq dike.

Li gor Komeleya Mafê Mirovî, 55 nivîskar û rojamevan ji ber dîtinên xwe di hefsan de ne, 35kes jî wan rojnamevan û nivîskarên Ozgur Gundemê ne. Gunay Aslan, Edip Polat, Omer Ağın jî wan in.

Dewlet êrîş dibe ser buroyên kovar û rojnameyê Kurdan û dest datîne ser alavên wan. Piştî Buroyên Ozgur Gundemê êrîş birin ser ya kovara Newroz Ateşî ya Stenbolê û dest danîn ser alet û arşîva wan.

Ismail Beşikçi jî ber ku rastiya Kurd û Kurdistanê tîne zimên dîsa îro di hefsê de ye. Nivîskar Ahmet Zeki Okçuoglu jî ber ku di kovara "Demokrat" de nivîseke wî derket, jî alî Mahkema Ewlekari ya Dewletê ya Stenbolê (DGM) hat girtin û 20 meh cezayê hefsê û 41 milyon jî cezayê pere danê. Cezayê wî tavilê ji aliyê Yargitayê hat tesdîq kirin. Serokê Sendîka Petrol İşe Munir Ceylan jî du sal ce-



İsmail Beşikçi nivê jiyana xwe di hefsê de derbas kir

zayê hefsê girt. Berbirsîyara kovara Berhemê Asli Yalçınoglu 18 meh cezayê hefsê û 500 milyon jî cezayê pere xwar.

Doc. Fikret Başkaya jî ji ber pirtûka xwe ya "Paradigmanın iflâsı" 20 meh heps û 41 milyon jî cezayê pere danê. Cezayê wî jî hat tesdîq kirin. Kitêba Malmisanij "Bitlisli Kemal Fevzî ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri" ku jî alî Weşanên Fîrat hatibû derxistin, bi biryara mahkemê hat berevkirin.

Berpirsiyarê Giştî yê kevn ê Medya Guneşi û nivîskarê wê Osman Aytar jî ber nivîsa xwe ya "di 93'an de gavên nuh" jî alî DGM'a Stenbolê, 2 sal cezayê hefsê û 100 milyon jî cezayê pere danê û Mahkema Bilind (Yargitay) di 30'ê Çileyê Pêşîn de cezayê wî tesdîq kirin. Osman Aytar berê jî hatibû girtin û 3 meh di hefsê de mabû.

Osman Aytar di derheqê qerara mahkemê de beyanek derxist. Aytar di beyana xwe de li ser kirinên dewletê disekine û cezayên hefsê yê li dijî rojnamevan û nivîskarên

Dûmahîk: r.11



Serokwezîra Tirkîyê Tansû Çiller û Serokerkanê Herb Dogan Gureş bi F-16 kampa Zelê bombebaran kirin.

Balafirên şerî yê Tirkîyê Kampa Zelê bombebaran kirin

Zêdetirî 50 balafirên şerî yê Tirkîyê kampa PKK'ê ya Zelê bombebaran kirin. Bi vî hawî dewleta Tirk careke din rûyê xwe yê terorîstiyê nîşan da.

Di 28'ê Çileyê Paşîn de zedetirî 50 balafirên şerî yê F-16 û F-4 yê Dewleta Tirkîyê di bin taqîya helikopteran de ku ji Meletayê û Diyarbekirê rabûn kampa PKK'ê ya Zelê ku di perçeyê Başûr de li ser sînorê Îranê ye, bombebaran kirin. Piştî êrîşa 1992'an ya dirandane ya dewleta Tirkîyê li dijî PKK'ê, PKK'ê hêza

xwe paşde vekişandibû û di bin himaya hukûmeta federa ya Kurdistanê Başûr de li Zelêyê kampê vekiribûn. Di vî kampê de pirani îxtiyar û zarok dijîn û serokê kampê jî birayê Abdullah Ocalan, Osman Ocalan bû.

Dûmahîk: r: 11

-Necmettin Buyukkaya di dilê me de diji r.

-Di çiroka Kurdi de mirin r. 5

-Neviyên Yezdan Şer r. 6-7

-Şî'reke Kurmancî ya Melayê Xasî r. 10

Rojeva Mehê

Çerxa Teblîx û Terorê

Ji bal me hemûyan ve nas e ku bi sedan sal e li Kurdistanê çerxeke dewleta dagirker hatiye li darxistin ku li ser himê zordariyê ava bûye. Çerxa dewletê, ji derveyî îrada millet bi darê zorê, kuştin û lêdanên dirindanehat avakirin û heta îro jî bi vî awayî dimeşe.

Çerxa ku li dar e ne çerkek wilo ye ku milletê Kurd ew nas kiriye, jê fehm kiriye ku çî ye û ne çî ye û piştre jî bi riza dilê xwe ji bo xwe hilbijartiye. Hinekên din bêyî haya vî milletî li gorî berjewehdî û daxwazên xwe ew amade kirine û anîne teblîxî millet kirine. Di vê teblîxê de jî par û firsenda qanîbûn, rizamendiyê nehatiye qebûl kirin. Kê teblîx bêdeng û bê îfraz qebûl kiriye, kiriye, yên ku nekirine bûne hedefa terora dewletê û bi zorê hatine teblîx kirin.

Tevgera Kurd a çekdar û piştre jî bi geşbûna wê re bi hûr û girên xwe hema hema hemû hêzên Kurdî, her ev felsefe kirin bingehên siyaseta xwe û rê û dirbên xebata xwe ya di nav milletî da li gorî vê felsefeyê hilbijartin. Bi kurtî û giştî mantiq wiha hat danîn: Dewleta Tirk bi zorê û terorê nîrê serdestiya xwe li Kurdistanê avakiriye. Milletê Kurd ne ji kêfa dilê xwe re lê ji tirsê xwe ev nîr li ser hustuyê xwe qebûl kiriye.

Erê rast e, milletê Kurd bi tirsandinê û darê zorê hatiye bindestkirin, lê ev nayê wê manê ku Kurd ji tirs û zordariyê pêştir tu tiştî fehm nakin û hela hela wazîfa tevgera Kurdî ne ew e ku ew vê tirsê jî dest dewletê derêxe û bi xwe bibe xwediyê tirsê. Wazîfe ew e ku ew tirs ji nava milletî rabe, millet ji tirs û xofê rizgar bibe. Roja ku ew yek bû wê millet ji bindestiyê jî rizgar bibe. Ji xwe heke ne welê be tû mana rizgarî, serbestî û azadiyê namîne

Helbet heta vê derê ev tesbît rast e. Lê hêzên Kurdî û berî herkesî jî tevgera çekdar a îroyîn netîceyeka şaş jî ve tesbîtê derxist ku ew netîce jî ev e; Kurd ji tirsê û ji darê zorê fahm dikin. Ji bo ku em karibin hukmê xwe li Kurdistanê li dar xî, divê me jî hêzek hebe ku şiddetê bikar bîne. Em ê siyaseta xwe bîr û bawerî û daxwaza xwe teblîxî milletî bikin, kê bi xweşkayî teblîxên me qebûl kirin, kirin, yên nekirin divê şiddet û zordarî li hemberî wan bê bikaranîn.

Ev yek bi dereceyekê li Kurdistanê bi serket, di van salên dawîn de li ser vê yekê geşbûna tevgerê di nav milletî de hat dîtin.

Gava dewletê dît ku tevger li Kurdistanê geş dibe û teblîx û terora mûesesen dewletê yên resmî têrê nakin, her li ser eynî felsefê rabû gelek dezgehên din jî avakirin. Yek jê avakirina "korucuyan" e ku ew hêz jî Kurdên sivil hatin avakirin û bi rastî jî karê wan bes teblîx û teror e. Piştre dewletê "Hizbullah" bera nav milletî da. Hizbullah di nav du sê salan de bi mana xwe ya rastîn û mecazî di teblîx û terora xwe de welê pêşde çû ku îro li her derê Kurdistanê xofeke mezin li nav xelkê veniştîye.

Netîce, ne ji aliyekî, ji çar aliyan çerxa teblîx û terorê li Kurdistanê dizîzike. Millet di bin diranên vê çerxa giran û pîralî de jî taqet ketiye, gêj bûye û bêhal ketiye. Gund tên xerakirin û şewitandin, bi refan insan ji mal û warên xwe direvin, mal û milken xwe bi cih dihêlin. Emniyeta can û mal jî tu aliya ve nemaye, her roj hema hema li her qeza û bajarî bi dehan insanên bêguneh tên kuştin. Jiyana aborî li Kurdistanê felc bûye. Qenaeta ku di nav milletî de peyda bûye; ne hêvî û ronahî ye lê tirs û bêhêvîti ye.


Tevgera Kurdî, mecbûr e li xwe varqile, rewşa millet a ku ji ber lidarxistina ve çerxa teblîx û terorê peyda bûye û rastiya milletî bibîne.

Çerkek wiha ji bo dewleta dijmin heta dereceyekê bikêr tê, lê ji bo tevgera ku di rêka azadî û rizgariya milletê xwe de avabûye bikêr nayê. Divê em misyona tevgera Kurdî baş tesbît bikin. Erê rast e, milletê Kurd bi tirsandinê û darê zorê hatiye bindestkirin, lê ev nayê wê manê ku Kurd ji tirs û zordariyê pêştir tu tiştî fehm nakin û hela hela wazîfa tevgera Kurdî ne ew e ku ew vê tirsê jî dest dewletê derêxe û bi xwe bibe xwediyê tirsê. Wazîfe ew e ku ew tirs ji nava milletî rabe, millet ji tirs û xofê rizgar bibe. Roja ku ew yek bû wê millet ji bindestiyê jî rizgar bibe. Ji xwe heke ne welê be tû mana rizgarî, serbestî û azadiyê namîne.

Bi vê baweriyê divê alternatîfekî wiha derxe ku çerxa teblîx û terorê perçe bike. Yan na her ku here, kaosa li Kurdistanê wê kurtir bibe.

Celîl Gadanî "Bawerî bi meleyên Îranê nayê"

Sekreterê Giştî yê KDP-Îranê-Reberayetiya Şoreşger Celîl Gadanî di 12'ê Çileyay Paşîn de hat buroya me Armançê ziyaret kir. Federeasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê jî bo Celîl Gadanî li Stokholmê jî civinek amade kir.



Sekreterê PDK-Î Rêberatiya Şoreşger Celîl Gadanî

Celîl Gadanî tevî grûbekê di 1988'an de ji PDK-Îranê vediqetin û bi navê PDK-Îranê-Rêberayetiya Şoreşger partiyêke din ava dikin. Lê ser sebebê veqetandinê Celîl Gadanî wiha dibêje: "sebebê veqetandina me ew bû ku di nav partiyê de demokrasiyê tunebû û baweriyayî me bi rejîma Îranê nedihat, em li dijî gufogyoyan bûn ku Partiyê bi

rejîmê re çêdikir."

Lê Partiya wan jî wek PDK-Îranê otonomiyê diparêze û ancax "bi çek wê bikaribin otonomiyê bidestxin". Ji bo wê jî li ser çiyayê Kurdistanê kampên wan hene û şerê çekdarî dikin.

Di warê tifaqan de ferqa wan û partiyê ew e ku têkiliya wan bi Mucahîdê Xelkê re heye.

Ji Serokê Navenda Lêkolînên Kurdî yê Moskovayê

Ji Clinton û Yeltsin re name

Wexta di nivê meha Çileyay Paşîn de Serokkomarê Amerikayê Bil Clinton Moskovayê ziyaret kir Serokê Navenda Lêkolînên Kurdî yê Moskovayê Prof. Şakîrê Miho Xudoyan ji Serokkomarê Rûsyayê Boris Yeltsîn û Serokkomarê Amerikayê Bil Clinton re nameyek şand.

Şakîrê Xudo di nameya xwe de li ser rewşa Kurd û Kurdistanê diskine û bi kurtayî van daxwazên jêr jî wan tê kirin.

a-Parastina mafê Kurdistanê Başûr, ku li ser prensîbên federalî û garantiya hêzên navnetewî di nav sînorên Iraqê de cî bigre.

b-Pejirandina Kurdan li Tirkîyê weke nijadekî cihê, ku pêwîste bibe xwediyê mafên çandî yên millî yên xwe. Ev yek dê bibe bingeha ragirtina şerê xwînê jî li Kurdistanê Bakur û peydabûna stabîlîtetê li Tirkîyê bixwe.


c-Pejirandina mafê Kurdan ji alî Sûriyê ve, ku Kurd bibin xwediyê mafên xwe yên millî di hundirê welêt de.

d-Bergirîya aksiyonên terorîstî yên fermandarên Îranê li dijî Kurdan û bicîanîna xudmuxtariya wan a navxwe.

48 saliya Komara Mahabadê

48 saliya Komara Mahabadê li Stockholmê di 22'yê Çirîya Paşîn de, ji alî Komîta Hevkarî ya hêzên siyasî yên Kurdistanî ve hate bîranîn. Di şevê de berpirsyarê hukumeta Kurdistan li Swêd, komîta PDK'î li Swêd û komîta Hevkarî axifîn. Di hersê axaftinan de mana rojê hate ziman û jibona jiyandina hukumeta Kurdistan ya iroj, girîngiya hevgerîna me giş Kurda hate xwestin. Ozanên me yên mezin Şivan Perwer, Nasir Rezazî û Delal bi stranên xwe yên hêja şev geş kirin.

Armanç
 Rojnama Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
 Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, Redaktorê berpirsyar: M. Elî,
 Berpirsyarê beşê Dimilkî: Maimisaniyê,
 Berpirsyarê rûpelên edebî: Ehmed Huseynî
 Utges av: Kurdîska Demokratîskî Arbetarunionen
 Aboneti/Prenumeration: Abonetiya Safekê, Li Skandinaviya: 200 SKR, Maqam/Myndigheter: 400 SKR, Li Ewropa: 50 DM. Li derveyî Ewropa: 40 \$,
 Anons/ilan: niv rûpel/en halvîdan 2500 SKR
 Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 50 37 99-9
 Adres: Box: 152 16
 161 15 Bromma/Sweden
 ISSN: 0348 7385



Welatparêzê hêja Ahmed Karli wefat kir

Tekoşerê Kurd, welatparêzê hêja Ahmed Karli di 7'ê Sibata de li Parîsê jî ber nexweşiya xwe ya dil wefat kir.

Ahmed Karli di sala 1943'an de li Swêgê hat dinê. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li Swêgê û lîseyê jî li Ruhayê xwend. Li Stenbolê Fakulteya Huqûqê xelas kir û wek abûqat kar kir.

Hîn di dema unîversîteyê de bi aktîfî bi siyaseta mijûl bû û yek ji damezrêner û berpirsyarê DDKO ya Stenbolê bû. Di nav Partiya Karkerî Kurdistanê (KÎP) de xebata xwe ya siyasî dom kir û bû endamê polîtuburoya wê partiyê. Li ber xebata xwe ya siyasî karê abûqatiyê jî kir û li Diyarbekirê û Ruhayê ket da'weya gelek kesên welatparêz û şoreşgerên Kurd.

Piştî derbeya 12'ê Îlona 1980'yî wek hemû kesên din yên şoreşger ew jî mecbûr ma ku welêt terk bike. Û çû bin xetê. Di perçebûna KÎP'ê de wî ne li cem KÎP'ê û ne jî li cem Pêşengê cih stand. Wî tevî grûbekê din, bi navê KÎP-Komîteya Muweqat ya Yekîtiyê ava kirin. Ev Komîte jî neçû serî û ew çû Fransayê û li vir îltîca kir.

Piştî di nav Platforma Bergehê de cî stand û wexta Hevgirtin-PDK ava bû wî jî di nav vî Partiyê de cîyê xwe stand.

30 salê jiyana xwe ji bo rizgariya Kurdistanê û azadiya gelê xwe da. Gelê Kurd tucarî wê wî ji bîr neke.

Em wek Redaksiyona Armançê ji malbata wî re sersaxiyê dixwazin û bila serê gelê Kurd sax be.

Kongreya Yekemîn ya TSK'ê

Tevgera Sosyalist a Kurdistanê (TSK) kongreya xwe ya yekemîn di Çileyay Paşîn de pêk anî û bi beyanekê jî raya giştî re da diyarkirin.

Di beyana TSK'ê de li ser rewşa cîhanê ya nûh, pîrsegirêkên Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li ser rewşa Kurdistanê tê rawestandin. Di beyanê de hukûmeta Federe ya Kurdistanê tê pesinandin û li hember dek û dolabên dijmin hişyarbûn ji hukûmetê tê xwestin.

Di beyanê de li ser yekîtiya hêzên sosyalîst yên Kurdistanê Bakur jî tê rawestandin û di vî warî de wiha tê gotin "Kongreya me, yek prensîp xebata ku di navbera WEKBÛN, KUK û TSK'ê de tê kirin ji bona yekîtiyê esas digre û ji bona yekîtiyê hîn firehtir biryara xebatê digre."

Di salvegera 10 em ya şehîdbûna wî de

Necmettîn Buyukkaya di dilê me de dijî

S. Bengîn

Min ji roja pêşî de li ser xwe wek barekî dîtîye ku li ser Necmettîn Büyükkaya (Selah) binivîsim û wî hinekî bi hemdemên wî ku wî baş nas nekiribûn û nîşê nû ku li welatê me mezîna bûye bidim nasîn. Îro deh sal piştî şehîdketina wî bi derengî be jî, ez dixwazim vê vatînyê bi cih bînim.

Danasîna jiyaneke sîyasî wek a Necmettîn, di rûpeleke kovarekê de ne hesan û ne jî mumkun e. Jiyana wî a ji xortaniyê pê de hemû ji bo bîdestxistina azadiya Kurdistanê, berxwedan, fedekarî û pêşengîyeke bi rûmet e. Loma jî Necmettîn hêjayê danasîneke kûrtir û firehtir e.

Necmettîn di 1943'an de li hêla Siwêrekê li gundê Qerexan (Karahana) ê hat dinê. Xwendina dibistana pêşî û a navîn li Siwêrekê xwendîye. Di 1961'an de çûye Diyarbekirê, li Lisa Ziya Gökâl sala yekem xwendîye. Lê piştî xwendina sala yekem, ji ber sedemên aborî çûye Edenê; him kar kirîye û him jî lîse xwendîye. Di 1965'an de li Îstanbolê dest bi Unîversîteya Huqûqê kirîye. Di 1966'an de wek pîranîya şoreşger û welatperwerên Kurd, ew jî dibê endamê Partiya Karkerên Tirkîyê (TIP). Sala 1970'î, sala xwendina wî ya dawî bû, lê ji ber kar û xebata sîyasî pêre negihîşt ku xwendina xwe biqedîne.

Destpêkirina xebata sîyasî

Dema Necmettîn li Îstanbolê dixwend, yek ji wan xortê Kurd yê pêşengê doza Kurd bû. Dema xwendevanên Kurd xwe ji tevgera Tirk cuda organize kirin, Necmettîn yek ji wanê ku roleke serreke dilîst bû. Di 1969-1970'î de li Îstanbolê DDKO'yê ava dikin û ew jî dibê serokê wê.

Dema cunta leşkerî ya 12'ê adara 1971 dest danî ser desthilata Tirkîyê, ji ber kar û xebata xwe ya li Îstanbolê, mahkûm bû. Piştî ku xwe çendakî li Tirkîyê û Kurdistanê veşart derbasbû Kurdistanê başûr. Li wir pêwendiyên wî bi Dr. Şivan re çêdibin û dibê endamê T-DKP. Dema Dr. Şivan, Çeko û Brûsk li Kurdistanê başûr hatin kuştin ew jî li wir bû. Dema tê dibihîstin ku Dr. Şivan û hevalên xwe hatine kuştin, bi alikariya dostan ew û çend hevalên xwe derbasî Sûriyê dibin, sal 1972 ye. Dema li Sûriyê bû, li Şamê mewanê Ekrem Cemil Paşa bû. Payiza sala 1972'an tê Swêdê. Du salan wek penaber li Swêdê maye. Di efûya 1974'an de vegeyîya welêt.

Hîn dema ku Necmettîn li derwayî welêt bû wî û hevalên xwe yê kevn xwestibûn ku Partiya ku Dr. Şivan serokê wê bû dîsa rakin ser pêyan. Sala 1973'an civîna heştan ya KM ya T-KDP dicivînin. Di civînê de tev hinek guhertinên di programê de partiyê ji nû ve ava dikin. Ew partiya ku paşê bi navê KÎP dihat naskirin, ev partî bû. Necmettîn di partiyê de wek endamê Polîturoyê kar kirîye. Sala 1977 ji ber hinek li



1969, Ahmed Karli û Necmettîn Büyükkaya, hevalên hev ên mektebê û hemşeriyê hev bûn, (foto: ji kitêba "Kalemimden Sayfalar")

hevnekirinên pratîk, destûrî û bawerîya cuda di derheqa tevaya xe-batê de, ji partiyê diqete û sîyasetê bi awayekî din didomîne. Wextê xwe bi pîranî da çareserkirina hinek pîrsgerêkên pratîk yê Kurdan. Min û wî piştî vî bîryara wî ya sîyasî dor du salan bû hev naskir.

Necmettîn pêşengîya avakirina KAK kir û heta ku şehîd ket Sekreterê Giştî bû. Navê KAK (Komela Azadiya Kurdistan li gor tradîsyona Kurdên soran bû û ne di wê maneya komelvaniya li Tir-kiye de bû.

Hê dema ku Necmettîn cara yekem çûbû Kurdistanê başûr, pêwendiyên wî bi çepên şoreşa başûr re çêbibûn. Ew pêwendî, dîre di şexsiyeta YNK de bi Kurdistanê başûr re dom kirine. YNK wê demê hewcedarê hinek bebetên piştgiriyê bû. Bêyî piştgirîya hinekan ji Kurdistanê Bakur, gelek kar ji bo YNK li başûrê welêt jî di buhayê ku ew dixistin nabêra mirin û serketinê de bûn. Necmettîn ev zanî bû. Ev piştgirî jî wî dikaribû bikira. Ev rûmet û berpirsariya şoreşgerî bû. Gelek keda wî di rabûn û xurtbûna YNK de heye. Bi YNK re gelek kar ji bo serketina YNK kirîye. Loma jî hinekan digotin ku Necmettîn kadyoyekî YNK'ê ye, tişteki ku li Kurdistanê bakur bike tune ye. Lê ev ne rast bû. Necmettîn şoreşgerê Kurdîstanî bû, bi Kurdistanê yekgirtî bawer bû. Pêwîst bû şoreşgerên Kurd li çar aliyên Kurdistanê rêxistinên xwe ava bikin; û bi harmonî bi hev re kar bikin. Ev rêxistin dikaribûn bi awayekî bi hev bihatina girêdan. Ne ku wê şaxê rêxistinêkê li beşekî din bihata avakirin. Ev du tiştên ji hev pir cuda ne û ji bo Necmettîn eşkere bû.

Necmettîn şoreşgerê Kurdîstanî bû. Ne serhildana Kurdistanê Başûr tenê bala wî dikişand. Pêwendiyên wî bi Kurdên beşê Îranê re jî başbûn. Dema serhildana Kurdistanê Îranê dest pê kir, xwe zû gihand wir. Dixwest bûyerê bi çavên xwe bibîne û ger ku tişteki ewî karibû bike, bike.

Necmettîn mirovekî serhildanê bû; mirovekî şoreşgerîya pratîk bû. Kirinên wî ji gotinên wî pirtir bûn. Ev li hemû deran û di hemû rewşan de wilo bû. Her di

serê kar de bû. Dema di zindanê de bû jî wilo bû. Yek ji wan pêşengên serhildanên zindanê bû. Tu caran serê xwe ji dîlîtyê re ne ditewand û mercên dîlîtyê qebûl nedikir bû.

Dema min cara yekem Necmettîn dît, min tişteki nû di şexsiyeta wî de dît: min cesaret û fedekarîya şoreşgerî di şexsiyeta wî de dît. Ji bo ku mirov pê bawer bibûya, ne pêwîst bû pir tiştan bêje û bike. Mirov bi hêsanî tê digihîşt ku ji azadkirina Kurdistanê pê de tu armancên wî yê din tune ne. Necmettîn bi van taybetiyên xwe ji hemû sîyasetvanên ku min heta wê rojê dîtibûn cuda bû. Loma jî min pir bi hêsanî qedera xwe ya sîyasî bi a wî ve girêda.

Em negihan ji hêla wextê de gelek karê sîyasî bi hev re bikin, lê her çend salên ku min wî naskir, ez bûm şahidê enerjî, egîfî, zîrekî, fedakarî, bawerî û dilovaniya mirovekî şoreşger û Kurdperwerekî evîndarê Kurdistanê.

Bêguman mirov sîyasetê li ser mercên jîyanê nake, lê ez dîsa ji pir bi hêsanî dikarim bêjim ger ku Necmettîn nehata girtin û şehîd neketa, wê rewşa sîyasî û rêxistinî a bakurê Kurdistanê ji a aniha cuda û baştir bûya. Wê sîyasat û xebat ne yek alî û îpotekkirî bûya.

Şehîdketina wî valahîyek mezîna anî. Helwesta di pêşengîya wî de bê serî û bê herdû nig mabû. Cîyê wî bi tu awayan ne dihat dagirtin. Programa xebatê û amadekarî hew bi wî re dikaribû serkeve.

Necmettîn sîyasat li ser bûyerên herêmî yê rojane nedikir, di derheqa pêşerojê de xwedîyê bawerîyeke qewîn bû û sîyasat li ser pêşerojê dikir. Lê ji bo ku karibe vî bike serê xwe bi analîzkirina bûyerên rojane jî bi qasî ku pêwîst bû diêşand. Wextê xwe yê "vala" bi xwendinê derbas dikir. Lê tu caran wextê wî têra nivîsên dirêj nedikir. Di derheqa her tiştan de notên kurt digirt. Û her wilo zêdeyî ku carnan notên kurt bigire, wextekî xwe yê dirêj nedabû xebata rêziman. Di dawîya pirtûka bi navê "Kalemimden Sayfalar" de çend rûpelên li ser

Dûmahik r. 11

NEYNIK

EM JI KÊ RE DINIVÎSIN?

Keder

Bê guman, xwenasîna netewî û çandî ya Kurdan di serdema nuh de, hişt ku pêşketinek mezîna û girîng di warê çapkîrin û weşandinên edebiyata Kurdî de çêbibe. Piraniya çap û weşanên Kurdî, bi taybetî, li Ewropayê derdikevin. Ev zahîra, ji alîkî ve baş e û ji alîkî din ve ne baş e. Lê ez dixwazim behsa pîrsek din bikim ku bi bawerîya min, pîr aktuel e.

Rewşenbîrên Kurd, îroj dixwazin çand û huwîyeta Kurdî vejînin. Di gel vî hindê, kar û xebatek giranbiha têt kirin. Weşandina kovar, rojname û pirtûkan bi zîmanê zîkmakî vî tiştî îsbat dike. Lê pîrs ev e: **Kî van weşanan dixwîne? Em ji kê re dinivîsin?**

Wek xwendevan, ez bêtirî deh salan li Ewropayê rûniştî me û şes salan jî li welêt min kar kiriye. Tiştê bala min kişand ew e, gava xwendevanên li dervî welêt, an jî rewşenbîrên li welêt, rojname, kovar û pirtûkên bi Kurdî dikevin destên wan, tu dibê qey wê ji kêfa bifirin, lê gava ew dest bi xwendinê dikin, ew wan çapemenîyan didin alî û dibêjin: "Em nikarin bixwînin", yê herî şareza ji wan dibêje: "Divê 'rojekê' ez xwe fêrî nivîsandin û xwendina Kurdî bikim". We bala xwe dayê "rojekê!". Ji alîkî ve dibêjin em nikarin bixwînin û ji alîkî din ve zîmanê Kurdî ji bo wan hêsan û nealoz e, di rojekê de karin fêrî wî bibin. Mixabin, Kurdên me yê bi gelek zîmanên biyanî dizan in, rojekê bi tenê vediqetînin ji bona zîmanê xwe yî zîkmakî. Ew roj jî, bi bawerîya min tu caran li wan ranaweste, heger raweste jî ewê li hijmarek gelekî kêr raweste.

Rewşa Kurdan ji gelek hêlên xwe ve ji ya gelek milletan perîşantir e. Gerê em zanibin ku zîman ne tenê desteka axaftin û têgehîştinê ye. Zîman heyîna gel e. Hilanîna zîman, gel jî ji holê hil tîne. Zîman yek ji nîşanên pêkhatina netewî ya herî girîng e. Zîmanê me bi saya dewlemendiya folklorê Kurdî ya devkî wisa paqij gihîştîye me.

Nivîskar Bavê Nazê dibêje "Bi hevokên sîpehî û gotinên resen hezkirina min ji zîmanê Kurdî re xurtir dibê. Ez bêtir ji xwe ewle dibim û bawerîya min bêtir bi pêşeroja milletê min tê. Heyamê berê dema danûstendina min bi çanda me re bi rîya zîmanên biyanî bû, min xwe û çanda xwe û bi vî yekê gelê xwe jî ji yê din nizimtir didît".

Gelo kî ji rewşenbîrên Kurd van faktan û heqîqetan nizane? Ew dizanin bi mirina zîmanê Kurdî re, wê kultura Kurdî jî bimire. Ew dizanin ku milletên cîranên me wek: Keldanî, Asûrî û Suryanî ji ber van faktayên han zîmanê xwe hêdî hêdî ji bîr dikin.

Ez nabêjim çima em bi Kurdî dinivîsin! Pîrsa min ew e, em ji kê re dinivîsin? Herkes ji me xweş dizane zîmanê me li welêt qedexe ye. Kolonyalîst firsetê nadin em bi zîmanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji ber vî tiştî pîrsek girîng tê holê. Berpirsariya ya kê ye ku Kurdên me bi zîmanê xwe nanivîsin û naxwînin?

Mamoste Osman Sebrî dibêje: "Eger tu bixwazî welatparêziya mirovekî binasî, bendewariya wî bi zîmanê zîkmakî ve bibîne". Gava em bixwazin welatparêziya kesekî nas bikin, ev peyvên mamosteyê hêja gerek ji me re bibin qanûnek ku em karibin jê derên.

Sed heft û mixabin ku li her çar perçeyên Kurdistanê bi milyonan Kurd asimîle bûne û bi zîmanê Kurdî napeyivin û nanivîsin. Peydabûna netecîyek weha trajedîk, dihêle ku Kurdên me zîmanê xwe biçûk bibînin.

Pîr hêsan e ku, mirov bibe evîndarê zîmanê dê û bavê xwe, ev zîmanê şîrîn û zengîn. Loma ez dixwazim zîmanê fêrbûna zîmanê zîkmakî daxim holê. Ez pîrsên xwe dibare nakim, lê ez dixwazim û rica dikim ji rojname Armançê ku ji nivîskar û xwendevanan re qorzikekê (quncikekê) teksîs bike ji bona ku ev tema han bê munaqêşekirin û herkes bîr û bawerîya xwe bide û bersiva vî pîrsa muhîm bi nivîsandin bike: Em ji kê re dinivîsin?

Ez nabêjim çima em bi Kurdî dinivîsin! Pîrsa min ew e: em ji kê re dinivîsin? Herkes ji me xweş dizane zîmanê me li welêt qedexe ye. Kolonyalîst firsetê nadin em bi zîmanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji ber vî tiştî pîrsek girîng tê holê. Berpirsariya ya kê ye ku Kurdên me bi zîmanê xwe nanivîsin û naxwînin?

RAMANÊN RAMANWERAN

Modernbûn, guherandin û hevdemî

Reşîd Bûrhan

Nûbûn û guherandin qanûnên jiyane ne. Ev zagon li gorî demê û lazimiye ne. Ji bo vê yekê, di axaftinan de û di nav rûpelên weşanên me Kurdan de hevokên derheqa "nuhbûnê, guherandinê û hevdemî pir derbas dibin, wek mînak: "Em xwe nuh bikin", "Metodên nuh ji me re divê", "Em mejiyê xwe biguherînin", "Em metodên xwe biguherînin", "Divê em li gorî politîka hevdemî, politîka xwe bimeşînin" û hwd. Rast e nuhbûn û guherandin ji me re divê û wê bivê. Jiyana û dinya li der û dora me tî guherandin, herdem tişt û pêvajokên nuh destpêdibe. Lê nabe gorî her guherandinê meriv xwe biguherîne û navê hevdemiyê li xwe bike. Nuhbûn û guherandina em bikin, divê pêşerojên wan hebe, li gorî dema me be û lazimiya me bi cih bîne.

1. Divê guherandin û nuhbûna me berê wan li pêşerojan bîne. Em mêjî û qabiliyet û zanebûna xwe, ji bo çareserkerina problemên xwe yê heye, bixebitînin. Bêguman potansiyela mêjî û zanebûnê, jibo çareserkerinê problemên hene ên rêya pêşerojê vekin bê sinor bin. Li gorî nêrîna min divê mirov ji % 80 potansiyela zanebûn, qabiliyet û enerjîya xwe ya ku heye bê xebitandin, ji bo pêşerojê jî ji % 20 potansiyela zanebûn û mêjî bîne xebitandin û ji bo hel-sengandina (analîz) paşerojan ku ders ji wan bîne standin.

2. Potansiyela me jî ji bo zanistiyê û lînerînan nuh bê sinor be. Lê firehbûn, kûrbûn û nuhbûna zanistiyê bi xwe nabe. Bêguman ji bo firehbûn, kûrbûn û nuhbûna zanistiyê xwendin divê. Xwendinek xurt, pir û bi berdewamî dikane tixûbên zanistiyê fireh, kûr û tekûz bike. Bê xwendin tu kes hevdem nabe û potansiyela tu mejîya pêş de nakeve. Çawa ji mîdê re xwarin divê, wisa jî, ji mêjî re xwendin divê. Gelo kesek mehê çend pirtûkan, rojê çend meqalên rojname û kovaran nexwîne wê çawa bibe xwediyê zanistiyek nûh, wê çawa xwe li gorî demê biguherîne û wê çawa bibe kesekî hevdemî? Lê ne her xwendin. Ji xwendinek efektîv re zanebûnek û xwe organîzasyon divê.

3. Rast e her bi xwendinê, mirov nûjen, hevdem nabe. Xwendin aletê e, rêgayekê

Bêguman, rexne aletê û rexnewarî krîterekî nujentiyê ye. Bê rexne pêşketin û bê pêşketin hevdemî nabe. Lê rexne ne aletêkî êrîşê ye. Ew jî bo rêya pêşketinê ye. Ji bo mirov ji rexnan re vekiribe, divê mirov hilm-fireh û bi sebir be, li hev guhdar bike, argumentên kesên li hember li bêjîngê xe. Lê mixabin, di rojên em tede dijin de, li ser nujentiyê û nuhbûnê pir tî axaftin, lê gava rexne tî holê, pevçûn, dilêşî çêdibe. Gelek kes tehemulê rexna nakin. Ji rastiyê direvin û bi xwe ne bawer in. Kesên ji rastiyê direvin ne hevdemî ne û nikarin bibin hevdemî.

ku mirov dikare xwe bi pêşde xe. Lê li hêla din, divê mirov wazîfeyên xwe yê demê pêkbîne. Divê mirov li gorî qabiliyet zanebûn û enerjîya xwe hewl bide ku mala xwe, dor û derê xwe û civata tî de diji biguhere û bi pêşde xe. Guherandin û nûbûn û nujentî ne bi gotinê ye, di pratîkê de ye.

4. Pratîk û bêjeyên mirovan divê hevûdu bigrin. Gava kesek ji bo nujentiyê û guherandinê diaxive, divê pratîka wî jî nûjen û guhertî be. Bi pêşniyaran, bi nêrînan û di jiyana xwe de hevdemî û nûh be. Ku ne wisa be, wê wek bêjeyên melên li mizgeftan be. "Ji peyvên melê bawer bikin, lê wek emelê (pratîka) wî nekin!". Neynika bêja û nêrînan pratîk e. Di jiyane de mirov divê nûjen be û wazîfên xwe yî hevdemiyê bi cih bîne.

5. Bêguman, rexne aletê û rexnewarî krîterekî nujentiyê ye. Bê rexne pêşketin û bê pêşketin hevdemî nabe. Lê rexne ne aletêkî êrîşê ye. Ew jî bo rêya pêşketinê ye. Ji bo mirov ji rexnan re vekiribe, divê mirov hilm-fireh û bi sebir be, li hev guhdar bike, argumentên kesên li hember li bêjîngê xe. Lê mixabin, di rojên em tede dijin de, li ser nujentiyê û nuhbûnê pir tî axaftin, lê gava rexne tî holê, pevçûn, dilêşî çêdibe. Gelek kes tehemulê rexna nakin. Ji rastiyê direvin û bi xwe ne bawer in. Kesên ji rastiyê direvin ne hevdemî ne û nikarin bibin hevdemî.

6. Îdea û nêrînan nûjen bi fakta ye. Lê mixabin hîn fakt, ji pîr nêrîna re dibe îdeyên pûç, meqalên bê mantik û vala, slogan û populîzm li civatê derbas dibe. Derew, înkarkirin û îftira dibe politîka ku di civatê de derbas dibe. Hîn berê Yûnanîyên kevn gotine "Gava fakt bi axifin, divê xwedan dengên xwe bibirin!" Kesên hevdemî divê vê yekê ji xwe re bikin zagon.

7. Bê dengî, bê helwêstî û

pasîftî nabe hevdemî. Dem bi dînamîkên xwe bi pêşde dikeve. Dînamîkên demê xurt û zû ne. Di hundirê dema me yîzû de, pîr çewtî, sûç, kêmasî û çêdibin. Ku li hemberî çewtî, kêmasî û sûcan tekoşin nebe, ew jî holê ranabin. Ji bo vê yekê ew kesên ji bo nuhbûnê, guherandinê û hevdemiyê bi axifinê û dînavîsîne divê dengê xwe û karê xwe tîxe nava deng û karên ew kesên li hemberî çewtîyan, kêmasîyan û sûcan tekoşinê didin. Bi şewekî aktîf bibe xwediyê deng û kar. Guherandin, nuhbûn û avakirina tiştên nûjen bi şewekî organîzasyon çêdibin.

8. Nûjenbûn meşa bi demê re ye û di demê de ye. Ji bo wî, kapitalê xwe wek giranbuhayekî bixebitîne û wî di beravê de bera nede. Jibo ku em ji civatek zêde bi axê û şertên îklîmê re girêdayî ne, pîr çaran em dema xwe vala dibihurînin, yan jî ji bo tiştên vala xerç dikin. Ku em dixwazin em xwe biguherînin û xwe nuh bikin, divê em xwe ji vê kevneşopê azad bikin.

9. Kesekî hevdemî azad e. Ew bi xwe difikire, berê ramanên wî berbi rojên pêşde ne. Partîyek, serokek an jî kesek jî dêvla wî nafikire. Eger mirov bi xwe nereme (nefikire), mirov azad nabe. Wek filozofan gotiye; "Azadî, fêrbûna mecbûriyetê ye."

10. Hevdemî karaktereke stabîl e. Li gorî hewa rojê vir de û wir de naçe û nayê. Bi dû populîzmê û mass-mediyayê nakeve. Lê ev nayê maneyê ku ew xwediyê lînerînan bi qalib e. Na, qalib dijinê, nuhtî, guherandin û hevdemiyê ye. Nuhbûn, guherandin û hendemî, ne rut-be ne, ne jî fexrek e. Ew ji me re, ji civata me re û ji bo pêşeroja me divê, wek nan, av û hewa ji me re divê...

Stiriyên me

Tilî Zinarê Xamo

Dibe ku tarîx tam ne rast be, lê bi texmîn wê di sala 1968'an ya jî di 1969'an de be, li Stenbolê şeveke şahiyê ya Qereqoçanê çêdibe. Ji Kurdperwerên wê demê Urffî Akkoyunlî jî di şevê de hazir e. Wek tî zanîn Urffî wê demê Kurdekî bi nav û deng e û gelekî jî tî hezkirin. Ew, yek ji girtiyên Hedîsa 49'an e jî. Lê serpêhatiya ku ez dixwazim li vir qal bikim ne jiyana Urffî ya siyasî ye. Belê, temaşevan tezehuratê dikin, dixwazin ku Urffî rabe axaftinekê bike. Urffî naxwaze, dibêje ez napeyvim. Lê temaşevan gelekî îsrar dikin, dibêjin hûn batil tu yê bipeyivî. Urffî bala xwe didê ku xelasiya wî tune ye, divê ku rabe çend gotinan bibêje. Dawiya dawî dihere sahnê û axaftineke kin dike. Dibêje:

—Hûn ji min daxwaza axaftinê dikin. Ma ezê çî bipeyivim, çî bibêjim? Hûn dizanin Kurd çî bibêjin, çî kar û xebatê bikin muheqqeq wê tiliya hînekan di vê kar û xebata wan de bibînin; wê bibêjin ya tiliya Sovyetê tî heye, ya jî ya Emerîka. Heyran, welleh ne tiliya Sovyetê tî heye û ne jî ya Emerîka; heger bi rastî tiliyek tî de hebe ew jî tiliya diyalektîkê ye, diyalektîkê!

Di ser van gotinên Urffiyê gorrubuş re zêdeyî bîst û pênc salan derbas bûn, lê dewleta Tirk bi hemû dem û dezgehên xwe ve hîn jî li vî meqamê xwe yê klasîk dixê: «Kurd jî derve tî pîjîkin. Tiliya Emerîka û Xerbê di vê meselê de heye. Sûriye, Ermenîstan û Yunanîstan bi vê meselê difîzin, ew Kurdan berra canê me didin. Heger ew tiliyên xwe ji nav meselê derxin wê tu gelşeke me nemîne.»

Berê, "tiliya tim di nav mesela Kurdî de" ya Sovyetê bû, lê ev "tilî şikiya", lema jî nema qala wê dikin. Lê di dêlî wê ve jî xwe re hin "tilyên" nuh dîtine. Nuha jî ev tiliyana ketine nav Tirkîyê û Tirkîyê li binê guhê hev dixin, dixwazin wê perçe bikin. Û jî bo ku Tirkîye perçe nebe divê bi xwediyên "tilyan" re bê lihevkerin, ew bêne razîkerin. Û Xwedêgiravî bi vê amancê ye ku serokên dewleta Tirk wek delalê kerê xwe wenda kiribe, çet nig di bin xwe ve nakin, rojê xwe diavêjin dextlê welatekî, bi wan re peymanên bi dizî û eşkere îmze dikin. Piştî her civîneke bi van dewletan re dest bi propagandayê dikin, dibêjin "van dewletana soz dane me ku ewê êdî hew alîkariya terorê bikin. Piştî ku ew alîkariyê nekin di nav demeke kin de emê vê meselê biqedînin." Ji serê salan ve ye ku dewleta Tirk ji millet re vê çirokê dubare dike.

Gelo bi rastî serokên dewleta Tirk bawer dikin ku mesela Kurd bi alîkarî û tahrîka hin dewletên xêrnexwaz û dijminên Tirkan hatiye meydanê, heger ne ev dewlet bin wê li Tirkîyê jî bin de gelşeke Kurdî tunebe? Bê guman ew jî tiştêkî wiha bawer nakin û misqalekî xwe jî di îddîyên wiha nadin. Lê li gel vê jî ew, giraniyê mezî didin propagandeyêke bi vî rengî. Çimkî bi vê riyê ew dixwazin rastiyê jî millet veşêrin, gelşê pîr biçûk, ne weke meseleyeke millî, lê weke meseleyeke polîsiyê nişan bidin. Û çareserkerina meseleyêke wiha jî bê guman wê ne siyasî be. Û jî bo tiştêkî wiha jî helbet wê rehettir piştgiriya millet bigrin. Ji ber ku ew dizanin di vî şerî de piştgiriya millet jî bi qasî hêza leşkerî muhîm e. Lema jî him li der û him jî li hundur propagandeyêke wiha dimeşînin, fena ku ew ne yê neheq in, ew ne êrîşkar, zorba û zalim in; lê yê neheq em in. Û divê em qebûl bikin ku dewleta Tirk di vî warî de serketî ye û gelek mesafe jî girtiye. Bi taybetî jî di vê sala dawî de dewleta Tirk ev siyaseta xwe bi millet, bi der û dora xwe û bi gelek hêzên siyasî da qebûl kirin. Meş û tevgerên ji bo piştgiriya dewletê tî çêkirin, şel û beyanên hêzên siyasî yê Tirkan heq dide vê dîna me.

Îro li Tirkîyê, li hember tevgera Kurd a millî muxalefet û dujminatîyêke mezî peyda bûye. Û ev dujminatî jî roj bi roj xurt-tir dibe; ku ev jî ji bo me netîceyêke pîr xerab û tehlûkeyêke mezî e. Li Ewropayê jî li gorî salek berê rewş xerabtir e. Dewleta Tirk, hema di çarçewa moral û propagandayê de be jî rewşa xwe baştir kiriye. Li hember çavên gelek hêzan em bûne terefê neheq û êrîşkar.

Gelo ev netîce bes ji ber zinyatî û jîriya berpirsiyarên Tirkan hatiye meydanê? Li gorî baweriya min na. Di vê netîca na baş de kêmasî û çewtîyên me Kurdan jî roleke mezî listine. Û helbet di vî warî de jî berpirsiyariya herî mezî ya PKK'ê ye.

Divê em baş bizanibin ji bo serketinê biheqbûna meriv tenê tîr nake, li gel vê, meşandina siyaseteke rast jî şert e. Di warê eskerî de em çiqasî xurt dibin bila bibin, gava bi vê xurtbûnê re em nizanibin siyaseteke rast jî bimeşînin emê zû bi zû bi sernekevin. Em mecbûr in di siyasete de jî zora dewleta Tirk bibin, û jî dilê bîr û raya wan qezenc bikin. Divê em hemû hêvîya xwe nekin lûleya tivingê tenê. Lema jî, piştgiriya gelê me û xurtbûna me ya eskerî divê me serxweş neke. Divê li gel vê, em kanibin piştgirî, alîkarî û dostanîya bîrûraya Tirkîyê û ya dunyayê jî bigrin. Heta ku em piştgirî û sempatiya wan her du qawetên muhîm negirin, doza xwe di warê siyasî de bi wan nedin qebûlkerin emê nikanibin dewleta Tirk mecbûrî lihevhatineke siyasî bikin. Yanî divê em nişanî gelê Tirk bidin ku "tiliya" kesî di vê meselê de tune ye û em ne maşeya kesî ne. Em doza mafên xwe yê millî û demokratîk dikin.

Lêkolîn

Mirin di çîrokên gelêrî yên Kurdî de

Mirin di çanda Kurdî ya gelêrî de cîhekî mezin digre, lew ew celebek ji jiyana mîletê kurd e. Jiyana Kurdan zincîrek bê dawî ji kuştin, talan, wêranî, zulm, rev, tirs ... hwd. Kuştin bi destê hêzên dijminî û mirin bi sedema kiryarên dijninan (belengazî, hejarî, nexweşî, bêwarî...). Mîletê Kurd, ta nuha, rojên vehesî û xêrxweş nedîtîye. Herdem Şûrê Demoqlîs li ser stûyê wî daliqandî maye. Jiyana Kurdî (jîna Kurdî) tracedîyek mezin e. Ev rewş, ne tenha di warên rojîyanê de, yanî ne tenha di warên civakî, aborî, yasayî û ramiyî de xwe eşkere dike, lê herweha di qada drûnî de jî, ango di asta hiş, raman, hest û sîkolocî de diyar dibe çî devokî û çî nivîskî, bi formên trajîk hatine hûnandin. Piraniya afirandinên gelêrî yên Kurdî li ser qedera trajîk û kambax ya "protagonîst" "ên wê di sekine, çî yekane û çî tevane, di çanda gelêrî ya Kurdî de cîhê trajedîya ji yê komedîya mezintire. Meyla xelqên Kurd pirtir berbi qise kirina babetên xembar û derdwere. Stran, dilan, çîrok, hikaye.. Tev tijî awaz û nefesên xemgînî. Sedema vî tiştî eve ku xelkê Kurd bi wan awayan dixwest (dixwaze) gazindên xwe bike. Gazindê xwe ji her kesî ku guhdarî bike, dixwaze balê bikişîne ser qedera xwe ya xerab. Ji aliyê din jî dixwaze celebekî ji pak-kirinê, pak-kirina hundirî, dirûnî peyda bike (yanî katharsîs). Mîletê Kurd, bi hev re, jiyandina mirinê dikin, mirin ji wan re nema dimîne tişteki awarte, ya biyanî, belko dibe perçek necuda ji jiyana rojane re. xuya dibe wek ku xelasî û serketin nema dimîne armançek arzûwer, lê leylandek cawîd (edebî) ku buhanê berde-wam bûna mirinê pêşkêş dike. Mirin dibe serencamek normal ji jiyaneke mirinxwaz re. Di çîrokên gelêrî de mirin ji her alî tê: hêzên dijminî, xurîst, dewar, xinizî, birakujî, nişkavî...hwd. yanî mirin dibe unsurekî normal û herdemî di nav jîyanê de.

Piraniya çîrokên gelêrî yên Kurdî bi mirinê (ya kuştinê) xelas dibe: Mem û Zîn, Sîyamend û Xecê, Kela Dimdim,... herweha di stranên Kurdî de piraniya babetan bi awakî tracîk derbas dibin. Meriv dikare bêje ku perçek mezin ji çanda Kurdî ya gelêrî bi kefenê mirinê hatîye pêçandin, di şerê Kurdan yê ji bo serxbûnê jî mirinê re cîhê giran heyde. Lew dijminan daxwazên Kurdan bi kuştinê bersiv dane. Ji ber vê jî mirin bûye çekek li hember mirinê yanî mirin dijî mirinê. Bala xwe dide navê şervanên Kurd: pêşmerge, yanî pêş mirin. Herweha bala xwe bide duruşma Kurdan: Kurdistan ya neman, yanî Kurdistan ya mirin. Di gotinên

pêşiyandê weha tê gotin: berxê nêr ji bo kêr, yanî ji bo kuştinê. Li vir, wek ku xuya ye, berx cîhê xortan digre, yanî wezîfa xortan ne ewe ku bi aştî perwerde bibin, lê xwe ji mirinê re amade bikin.

Ev tîkelî bi mirinê meweşa dîrokek dirêj ji şikestinane. Ev şikestinan her dem bi kuştin û xûnrîjandinê dihatin tac kirin. Civata Kurdistanê bi xûnê hatîye neqîş kirin. Zulm û zora ku ji derve dihat (diê) xwe li hundir jî bi awakî makokiyên hundirî eşkere dikir (dike). Şerê dij-

mina li ser Kurda bi dîrokeke bû rewşek rojane ku di hemû rehên jîyanê derbas dibî. Roj bi roj şer dibe "kar"ek, dibe terzê yekane ji jîyanê. Li dawî hebûna dijmin dibe zixtek da ku hêzê di laşê civatê de bîafirîne, lê civatek bi şer û kuştinê bê avakirin civatek birîndar e, nexweşe. Şexsiyata mirov êdî xerab dibe. Herkes xwe şervan dibîne, yanî xerabkar. Kes bi awakirinê naramê, lê bi hilweşandinê. Ji bo xerabkirina dijmin rengê ji xerabkirina xwe heye, ji orta kuştinê xwekuştin derdikeve: birakujîya di navbera Kurdan de, êl, eşîr, hêz..., Şerê di navbera misilman û êzîdîyan de, di navbera misilman û xirîstîyanan de, di navbera niştimanperwer û noke-ran de, di navbera "pêşverû" û "paşverû" yan de...û hwd. Lê di hindirê vê de jî hizkirina kuştin, mirin întixar... di hundirê kes de jî ava dibe û ya herî giştî eve ku mirin dibe mêvanekî bixêr hatî.

Mirin bi şeweyên cûrbecûr di çîrokên gelêrî de peyda dibe. Di "Mem û Zîn"ê de mirina herdu evîndaran serencama xinizîya Beko ye. Beko naxwaze evîna wan serkevi û biçê serî. Çima Beko weha dike? Dibe meriv bêje ku hizkirina wî ji keça xwêre wî daf dide ku evîna Mem û Zîn xerab bike, lê ew dizane ku Sûda vî karî nîne çûnku Mem evîndarê Zîna Mîr Îzedîn e, ne Zîna Beko ya Kirêt. Yanî karê Beko tevgerêk çavnebarîyê ye. Ev çavnebarî di-hêle ku qedera du evîndaran bi pelêxe: êş û xem û mirinê belav bike. Beko dijî Mem dixebite, tevî ku Mem hiç xirabî pê nekiriye, Beko antîteza Mem e.



Mem= xêr, xweşî, zaneyî, comerdî, dilpakî. Beko= şer, nexweşî, nezani, çavtengî, dilxirabî. Her çend ku Beko şexsek tenê, yê pîse, lê zora Memê zengîn û xweşik dibe. Qedera Mem ewe ku bimire, ku bi evîna xwe şad nebe.

Di çîrokê de mirin mirinê li pey xwe dikşîne: Mem dimre dûvre Zînê, dûvre Beko. Herweha şerê ku di nav xelqên Cizîra Botan û dijminan (ku em nizanin kîne) de derikeve dibe sedema nîrîna pir kesên, çî ji dostan û çî ji neyaran. Di hinek aliyên xwe yên metodî, "Mem û Zîn" wek tracedîyên griki ye, qedera kesên bi awakî pêşîn de tê nivisandin, lê herweha pir ji ûnsûrên Şêkspîrî (Shakespeare) di çîrokê de heye (Romeo û Jûliet, Hamlet, Makbeth...) ûnsûrên her giştî di navbera wan de eve: mirin bi lepên xwe rûyê jîyanê diqelêşe. Mirin ji zikî dubendîyên civakî, şexsî, psîko-locî...hwd. dertê.

Sazûmaniya civakî ewhaye ku çend malên dewlemend, xwedî nav û deng dirav, û pîre jî xwedî hêz, hene. Ew bazarvanên malên mîrîtiya Cizîrê nin ku îdare kirina wê bi destê wan e. Li aliyê din tevaya xelkê kesên sade û reben nin. Zînê keça Mîr e, xwedîyê Cizîra Botan. Mem bi xwe jî mîrzade ye. Mem û Zîn, herdu jî ciwan û xweşik in. Dixwazin bigihên hevdu û evîna ku di navbera wan çêbû bidin jîyandin, lê ne tenê astengên coxrafi li pêş wan derdikevin, lê herweha yên civakî, êlî, mirovî jî. Alozên cûrbecûr dertên û pêvajoya dramatik pêk tînin ta ku digêhên serî bi destê Beko, ew kesê ku

kontrastan diteqîne. Beko ne ji qata maldar û aristokrat e, ew xulam e. Di karekera wî de kêmasiyên mirovî asêbûne, ew dixwaze xêr şahî li kesî belav nebe, ew xiniz e. Ew dixwaze Mem bi fen û hîlan û xapan bike nesibê keça xwe ya kirêt, yanî dixwaze xerabiyê bi keça Mîr bike Mîrê ku wî bi nan û kiras dike ne tenê dijî Mem derdikeve lê herweha dijî Zînê jî. Bi gelacî, derew, dek, xwe derbasî nav her tiştî dike. Beko sembola bedkarî ya ku di hundirê mirov de ye.

Mirin ew çare ye ku nakokiyên rengareng wî bi pêş de diînin. Lê eger di "Mem û Zîn"ê de mirin bi destê Bekoyê pîs tê, di çîroka "Sîyamend û Xecê" bi destê ceneweran tê. Evîna Sîyamend û Xecê diqurmîçe û naçe serî. Mirin wan herdu wan jî dixê xefka xwe. Gelo mirina wan bersiva karê Sîyamend e? (revandina Xecê dijî vîna civatê)? Evîna wan ji pêşî de ne pîroz bû çûnku piştgiyaya kesî ne stendibûn. Herweha newek-heviya civakî di navbera Sîyamend û Xecê de heye. Sîyamend sêwî, bê dê û bê bav e, lê Xecê destgiyaya kurê serokeşîrê ye. Di roja daweta wê de Sîyamend wê direvîne û siwarên eşîrê li pey wan diçin, da ku wan bigrin. Xuyaye ku pêwendî jî destpêkê de bi aloz e. Karê wan yê dijî raya giştî ya eşîrê destê felekê tê hesap kirin. Mirin problemê çareser dike. Pezkovî sînorek ji jiyana wan re datîne. Wek efsane ya "Adonîs û Îştîr" tracedî ya Sîyamend û Xecê bi destê canewerekî tê xêz kirin.

Çîroka gelêrî ya "Mamo û Eysê" jî bi mirinê bi dawî tê.

Mamo ew xortê nûhatî, bîst salî, ku bi dileki fireh xwe dide ber pêlên jîyanê, bi hemû hêza xwe dixwaze jîyanek geş, şad bijî. Dibe çaxa zewaca wî: "Dayê eger ez serê te ne êşînim, ezê Eysê ji xwe re bînim". Eysê xweşikûrîna keça wê deverê ye, ji malek mezin û navdar e.

"Dayê, min di xewna xwe de dît ku ez Eysê diînim û ji te re dibe sened û stûn". Dêya pîr di here Eysê dixwaze. Memo û Eysê dibin bûk û zava û dêya pîr bi wan re şad dibe. Roj li pey roja derbas dibin, ta ji nişkeve fermana dewleta tirkî tê ku hemû xort biçin leşkeriyê. "Kurdan ti xêr ji destê tirkan nedîtî" in. Memo diçe, wî dişînin welatê ereban yên germ. Eysê û pîrê tenê di malê de dimînin. Heft salan Memo vedigere. Bi şevê dighê mal reşê wî yê siwarî dibîne, wî nas nake, dixwaze jê bipirse gelo Memo nedîtîye. "Mêvanê delal, hatina te pîroz be, tu mêvanê rûmeta Memo ye". "Keçê, Eysê ez Memo me" Herdu bi kêf xwe davêjin paxila hevdu. Pîrê çûye xew kiriyê, Memo dixwaze wê şiyar bike lê Eysê naxwaze wê ji xew rake û wê bi heyecan bike. "Sibê zû emê wê şiyar bikin û nûçeya hatina te jê re bêjin". Çaxa sibê pîrê ji xew radibe û hespekî xerib li ber derî dibîne, mat dimîne. Diçe oda Eysê dibîne xortekî xerib di ber de razaye: "Xwedê mala jinan xerab bike, Eysê bêbextiya Memo kirî û bi yekî xerib re razaye". Ji diwêr radihêje xencerê, ew xencera Memo ya ji kevn de pêve daliqandî ye. Xencerê bi hêz di singa Memo de diçikîne. Memo axîna mirinê berdide û Eysê dike hawar: "Dayê, xwedê te kor bike,

destê te pûç bibe zîmanê te lal bibe, te çî kir? te Memo, kurê xwe kuşt"

Dawî pîrê dîn dibe, bi çola dikeve, dibe gurek û bi çolê dikevî. Nivîskarê misrê Cemal Al Xîtanî ev çîrok li hember Şanoya Albert Camus (Albêr Kamî), ya bi navê "Re malontendu" daniye.

Kuştina Memo bi destê dêya wî tracedîyek bê hempa li dar dixê. Hêvî û ûmîda sê kesên bi hev re tê kuştin: ya Mamo, ya Eysê û ya pîrê. Çî hişt ev sosret bi kar bê? Çîna Memo bo leşkeriyê ya ku esasê dramatik danî, yan jî qeda û qeder ya ku ne bi destê ti kesî ye?

Herçibe, mirina Memo ya trajîk naveroka rîmanî ya kesê Kurd eşkere dike, ku tede mirin bi her awayî ber bi pêş tê.

Eger çîrokên evîni, romantîk bi mirinê dawî tînin, çawaye êdî çîrokên şer, şer ku di navbera Kurdan û dijminên wan de derdikevin? Bêguman tijî mirin, kuştin talan, xûn û wêranî ye. Di "Kela Dimdim" de mirin qedera parêzgerên kelê ye. Herweha di çîrokên qehremanî yên li ser mîrxasên Kurd ne, piraniya mîrxasên Kurd bi xedr û dexsî hatine kuştin, yan jî xiniziyê ew sipartine destê dijmin, yan destê mirinê.

Çîrokên gelêrî yên Kurdî, dîroka gelê Kurd qise dikin, çîroka kuştin û mirinê. Ma dîroka gelê Kurd ya dirêj ne çîrokek bi xûnê hatîye nivisandin?!

Nîzar Agirî

Nevîyên Yezdan Şêr

Mahmûd Lewendi

Yezdan Şêr

(?-1868)

Yezdan Şêr kurê Mîr Sêvdîn e. Biraziyê Mîr Bedirxan e. Û xwarzîyê Seîd Begê xwediyê kela Gurkêlê ye (*Kela Gurkêlê li herêma Şernexê di navbera Gundik û Sêgirkê de ye*).

Çawa ku Mîr Bedirxan li hember Seîd Begê Gurkêlê li cem Osmanîyan cih digre û piştê ew bi xwe ji bo avakirina Kurdistanê li dij Osmanîyan radibe, lê wê carê jî biraziyê wî Yezdan Şêr ji teref Osmanîyan tê xapandin û ew jî li dij mamê xwe Mîr Bedirxan radibe. Îcar şeş sal piştî şikestina serhildana Mîr Bedirxan; di 1854'an de Yezdan Şêr ji bo avakirina Kurdistanê serî hil dide. Hema hema çî bigre seranserî Kurdistanê dike bin hukmê xwe. Hejmara leşkerên wî dibe nêzî sed hezar kes. Lê piştê re bi listika hin dewletên rojava û bi soz û ehdên Osmanîyan goya Yezdan Şêr û Osmanî li hev tîn, lê Osmanî wî digrin û surgûnî Îstebolê dikin. Li Îstebolê demekê wî dixin

zîndanê.

Paşê Osmanî wekî ku li Mîr Bedirxan kirin, wî jî dikin paşa û wî dişînin Yanya (Yunanîstan)ye. Yezdan Şêr li Yanyayê di 1284'an (1868 Mîladî) de wefat dike (*Agahdariya li ser wefata wî ji dest-nivîseke Malmîsanîj hatîye girtin*).


Mîr Bedirxan heta wefata xwe jî li dij Yezdan Şêr bûye. Heta tê gotin ku keça Mîr Bedirxan Nefîseyê ji kurê Yezdan Şêr Tahîr re xwestine, ew bi tundî li dij derke-

tiye. Lê piştî wefata Mîr Bedirxan keça wî didin kurê Yezdan Şêr.


(*Navê Yezdan Şêr jî di nav Kurdan de bi gelek awayan tê telafûzkirin, wek; Êzdîn Şêr, Îzzedîn Şêr, Yêzdîn Şêr û Yezdan Şêr*).

Nevîyên Yezdan Şêr yên li Şamê

Di 27.06.1993'an de li gel Dîlawerê Zengî û Mumtaz



Secera malbata Yezdan Şêr



Yezdan Şêr, Şam (sal: 1940 ?)

em çûn mala Xada Bedirxan. Rojek berî wê Dîlawerê Zengî telefonî Xada Bedirxan kir, ji bo roja din wext veqetand. Saet 16.00 em çûn Mala Xada Bedirxan. Mala wê li Şamê, nêzî Fındîq Şam û mehella Darulselamê ye..

Çend roj berî ku em herin mala wê, me bi Dîlawerê Zengî re li ser malbata Bedirxaniyan û Rewşen Bedirxanê me ji xwe re sohbet dikir. Di nav sobetê de


zû an jî dereng diçûn qet ne xem bû. Lê ji bo mala wê xanimê, Dîlawer pir deqîq bû. Neyse, saet bû 16.00. Em hêdî hêdî bi derencayan de hilkişîyan, hatin ber deriyê wê. Dîlawer li derî xist. Jinikeka 40-45 salî ji me re derî vekir, em derbasî hundur bûn, li oda mêwanan rûniştin. Ji raxistina malê xuya bû ku malek dewlemend bû an jî bi kêmanî ji dewlemendiyê fêhm dikirin.

Em li ser qoltixên çermîn rûniştin. Jinika ku ji me re derî vekir, hat yeko yeko destê me toqe kir û bi Erebi got hun bi xêr hatine. Dîlawer em bi hev dan naskirin. Ku em ji Swêdê tîn, em Kurdên Turkiyê ne, em ji bo Armançê dixwazin li gel wê qise bikin û hwd. Axirkê geh bi niv erebiya xwe, geh bi niv îngilîziya wê û kurdiya wê û bi niv îngilîziya Mumtaz û ji gişa baştir



Edibe û Yezdan Şêr (Edibe xuşka Yezdan Şêr e)


Li piştê orijînalê vî rîsmî bi herfên Erebi, Latîni û Ermenî weha hatiye nivîsin: "Fotograf Gerabet Krikoryan-Qudsîşerif" û bi Latîni jî "Photographie G. Krikorian, Palestine, Jerusalem". Ji kaxeza risim diyar e ku yê salên 1900'i, an jî yê berî wê ye.



Yezdan Şêr li qaweyê Şamê (sal: 1936 ?)

gotinê gotin vekir û gotin hat ser Bedirxaniyên din ên ku li Şamê ne. Di wê navê de navê Xada Bedirxan derbas bû. Min pirsî "Xada Bedirxan kî ye?". Got "keça Yusuf Bedirxan e, lê Yusuf Bedirxan pir xwe nêzî kurdayetiyê nekirîye". Min ji Dîlawer xwest ku em Xada Bedirxan bibînin. Çimkî min qet heta wê rojê ne navê wê û ne jî navê Yusuf Bedirxan bihîstibû. Bi vî awayî bi wasita Dîlawer me têkilî bi Xada Bedirxan re danî. Li gor qewlê xwe yê jorîn em çûn mala wê.

Saet hê ji 16.00'an re 10 deqqe hebû. Dîlawer got "hê zû ye, em piçekî li vê taxê bigerin, bila wexta me tijî bibe paşê em herin". Ecciayîb, halbû em diçûn mala kijan Kurdî ya em niv saet



Yusuf Bedirxan (1903-1989), (Yusuf Bedirxan wê demê li Şamê di daira Fransîyan de wek polisê kor dikir. Yusuf Bedirxan bavê Xada Bedirxan û apê Rewşen Bedirxan e. Di salên 1930'i de li Şamê hatiye kişandin).

Lêkolîn



Tahir Bedirxan (Xuya ye ev Tahir ne kurê Yezdan Şêr e, dibe ku neviyê Tahir Bedirxan ê kurê Yezdan Şêr be, yanê birayê Aîşe Bedirxan be - li tabloya secera malbata Yezdan Şêr binêre)




Yusuf Bedirxan û Aîşe Bedirxan

Navê Kalikê min
Yezdan Şêr e

Belê kalikê Xada Bedirxan kurde bi nav û deng, Yezdan Şêr e. Lê kîjan Yezdan Şêr? Ew ne diyar e. Îcar gava ku me navê Yezdan Şêr ji devê wê bihist, ez jî Mumtaz jî Dîlawer jî wekî ku em rastî gencîneyek, xezîneyek zêr hatibin û em dikolin. Her ku em dikolin zêr û ziv û elmas û aqût derdikevin; Yusif Bedirxan, Mahmûd Bedirxan, Tahir Bedirxan, Ayşe Bedirxan û Yezdan Şêr ...û Bedirxanî û Bedirxanî.

bi tercumanîya Dilawer me suhbetek dîr û dirêj kir. Di vê navê de ji me re qahwe, zebeş û pişt re jî şerbet anîn.

Û em her suhbata xwe jî dikin, her ku em suhbetê dikin, meraqa me bêtir li suhbetê vedibe û pirs pirsê vedike û em dipirsin, ew jî carna bersiv dide û carna jî pel pel li me dinihêre.



Edibe Bedirxan (Xuşka Yezdan Şêr) Ev risim jî diyar e di salên 1900'î an jî berî wê hatiye kişandin. Li piştî risim bi herfên Latîni weha hatiye nivîsîn: "Photographie S. G. Harentz, Damas".

Bermaya parçeyek ji tarîxa Kurda nuha li hember me rûniştîye bi me re suhbetê dike. Me pirsî û wê got:

"Navê bavê min Yusif Bedirxan (1903-1989) e. Yusif Bedirxan birayê M. Salih Bedirxan e û apê

Rewşen Bedirxan e. Bavê Yusif Bedirxan Mahmûd Azîzî ye. Mahmûd Azîzî li Şamê abûqat bû. Yusif Bedirxan di dema Fransîzan de li Sûriyê esker bû, pişt re bû polisê Fransî li Şamê. Wê wextê bavê min Yusif Bedirxan bi keça Yezdan Şêr Aîşe (1913-1979) re dizewice. Xuşkek û birakî min hene, navê xuşka min Behîye Bedirxan e, navê birayê min jî Mahmûd Bedirxan e. Bavê min Yusif Bedirxan navê bavê xwe li kurê xwe kiribû".

Xada Bedirxan 1949'an de ji dayik bûye. Li Şamê li mektebeke Ermenîyan mamostetîya zimanê Erebbî dike. Mêrê wê Çerkez e. Xada Bedirxan ji ber ku Kurdî nizanibû (piçekî fêm dikir) pir li ber xwe diket. Heta liberxweketina wê ji vê gotina wê hat fêm kirin, wexta ku me got "ma tu bi Çerkezî zanî?". Got "na, zarokên min jî ne bi Kurdî û ne jî bi Çerkezî dizanin". Wekî ku ji me re bide îspatkirin ku her çendî bi Kurdî nizanin lê nebûne Çerkez jî.

Dîsa li gor gotina wê: Yezdan Şêr piştî ku şerê wî ye li hember Osmanîyan şikestîye, ew surgûnî Îstenbolê kirine, pişt re hatiye Şamê. Li Şamê li Goristana Bab-zixirê veşartine. Heşt zarokên Yezdan Şêr hebûn, navê wan:

Xalî: li Îngîltereyê dimîne.
Hadî: li Amerîkayê dimîne.
Delal: li Urdunê dimîne.
Sêvdfîn: li Amerîkayê dimîne û di pîrsa Kurdan de aktif e.
Selîm: li Urdunê dimîne, di pîrsa Kurdan de aktif e.
Alî: li Belçîkayê dimîne.
Tahir: li Urdunê dimîne, navê kurê wî Yezdan Şêr e.

Aîşe: diya Xada Bedirxan e, bi Yusif Bedirxanê kurê Mahmûd Azîzî re dizewice. Yusif Bedirxan birayê M. Salih Bedirxanê bavê Rewşen Bedirxan e. Mahmûd Azîzî bi xwe li Şamê dima,

Nivîsa li ser kêla Tahir û Yezdan Şêr (ruyê derve, nivîsa li ser kêlê bi Tirkî ye) (li gor gotina Xada Bedirxan, kêl û kevirên ku gorra Yezdan Şêr pê hatiye lêkirin, wê demê li Îstenbolê dane çêkirin û anîne Şamê. Ev yek jî pîrika wê yanê jina Yezdan Şêr jê re gotiye.) Yên li ber gorre sekinîne Xada Bedirxan û keça xwe ne. (foto: Ar-manc)

Ya rehim

Gün gibi dünyada kim açtı göz nam eyledi
Mebğur ikbad döndü pek nza akşam eyledi

....

Akîbet mahv eyleyüp isbat-i obam(?) eyledi
Gulşen adabın bir bülbül idi Tahir'im
Ayende tuttu ecel-i seyyad bir dam eyledi
Btfe(?) lüdm(?) 'alayı fevtî tarihin sual
Ruhi Tahir söyledi cennetde aram eyledi
İzzeddin Şêr Paşazade Muhammed Tahir Beg
ruhi için fatiha Sene: 1308
Dufîne el-merhum Muhammed Tahir Bedirxan
an
Fî 2 Zülqaade Senet: 1380

Nivîsa li ser kêla Tahir û Yezdan Şêr (ruyê hundur)

Dufîne el merhum İzzeddîn Beg el-merhum Tahir Beg Bedirxan Paşa
Cemad el-cveq 774 Sene: 1359

Nivîsa li ser kêla Aîşe Bedirxan

El Fatîha
Dufînet ul-merhûme el-Hace Aîşe binit
'İzzeddîn Bedirxan.
Fî 15 Remezan, 1399, 9 Ab 1979



abûqat bû, li Şamê mir, li goristana Şêx Xalîte Nexşibendî veşartine.

Piştî gelek agahdarî û hin tarîxan ez piçekî ketim gumanan. Çimkî Xada Bedirxan got "li cem min rismê Yezdan Şêr jî heye". Û çû lê gerya, lê nedî. Me ji bo rojek din dîsa soz da hev; hem ji bo risman û hem jî ji bo çûyina ser gorra Yezdan Şêr.

Di 14.06.93'an de dîsa ez û Dilawerê Zengî li Şamê em çûn mala Xada Bedirxan. Xuya bû ji berê de hazîriya xwe kiribû. Li gel qahwê hin rismên kevn jî anîn. Û yeko yeko ji me re got: "Ev Yezdan Şêr e, ev Xuşka wî Edibe ye, ev...."

Pişt re bi texsîyekê em çûn Goristana Bab es-Sexîr. Xada Bedirxan pêşî gorra Yezdan Şêr nişanî me da, pişt re yê Yusif Bedirxan û Aîşe Bedirxan.

Yezdan Şêrê
neviyê Yezdan Şêr

Piştî ku min rismê Yezdan Şêr û yên zarok û xuşka wî dîtîn, êdî bi temamî min bawer kir ku ew Yezdan Şêr ne ew Yezdan Şêr e ku li dij Osmanîyan rabûbû. Ev Yezdan Şêr kurê Tahir Bedirxanê kurê Yezdan Şêr e. Çimkî Xada Bedirxan rismê zarotîya Yezdan Şêr nişanî me da ku wê demê li Qudîsê hatiye kişandin. Îcar ew Yezdan Şêrê ku di 1854'an de serî hildaye, ku hê wê wextê fotograf nehatibû Kurdistanê, îcar hela tew ev rismê biçûkiya wî be, ji xwe hê bêtir nakeve ber aqilan. Çimkî fotograf piştî salên 1840'î hatiye Îstenbolê. Ji ber wê ez dibêjim ev risim yê Yezdan Şêr ê neviyê Yezdan Şêr e.

Ji xwe piştî ku em çûn ser gorren wan, ji tarîx û nivîsên li ser kêlên wan baştir derket meyd-



Yezdan Şêr ê neviyê Yezdan Şêr bi cil û bergê Kurdî

nê ku ev hemû zarok û neviyên wî ne.

Yanê bi kurtî Xada Bedirxan keça Aîşe Bedirxan e, Aîşe Bedirxan keça Yezdan Şêr e, Yezdan Şêr kurê Tahir Bedirxan e, Tahir Bedirxan jî kurê Yezdan Şêrê birayê Mîr Bedirxan e.

Û bi vê bahaneyê her çendî me rism û gora Yezdan Şêrê ku di 1854'an de ji bo avakirina Kurdistanê serî hildabû nedît jî, lê yên zarok û neviyên wî derketin meydane.

Nuha li vir wekî ku xwendevan jî dibînin, li gel hin agahdarîyên biçûk, rismên ku me ji Xada Bedirxan girtine û yên ku me bi xwe kişandine pêşkêşî xwendevanan dikin.

Çand û wêje

Ziman û afirandin

1

Bi xwe spartina li ser jindariya zimanê netewî, heyîn û kesayetiya mirovan û civatan ji wendabûnê tête parastin. her kes, wek endamê civateke netewî, dişê, eger û merc û sedemên berdwamiya hebûna xwe ji berdwamiya hebûna zimanê xwe yê netewî-zikmakî, wergire. herweha, her kes rastiya bûneweriya xwe ya civakî, siyasî, dirokî, çandeyî û şaristanî ji rastiya hevgerîna û rada çesipîna zimanê xwe bi dest dixîne.

Bi alîkariya ziman (wek bûnewerekî bi laş û bi giyan), ziman wek alavê seretayî ê têgihîştinê û ê derbirînê, bîr û baweriyên kevn û nuh ên civatê, rewîşt û gerdîşe, mîrat û kelepör, dirok û ol, felsefe û raman û lojîk, tore û huner û wêje, pişe û alav, gêwil û rengvedanên psikolojî xwe nêzikî hevdu dikin. Û bi hev re, çand û rewşenî û kultûra wan xelkên ku bi "VÎ" zimanî an bi "WÎ" zimanî dipeyivin, pêktûnin, dadimezirînin.

Bi kurtî... Ziman pencereya zêrînî ya mirov e, di wê pencereyê re dikare li dorhêla xwe û li gerdûnê temaşe bike. Ziman "EZ" a mirov e, "ez" eke bilind û paydar e, bûne, kesatiye. Bêyî ziman ne em dikarin nêrînen xwe li ser tiştan çê bikin, û ne jî em dikarin awiran, bîr û baweriyên Idyolojî damezirînin.

Wek ku HAYDGER dibêje: " Ziman xaniyê bûneweriyê ye"

Ji destpêka dagirkirina Kurdistan ve hetanî vê kêlikê tu carî proje û pîlanên hewldana ji holê rakirina nasname û taybetmendiyên kesatiya mirovê Kurd ranewestiyane. Di wê hewldanê de, reng e, zimanê Kurdî ji her tiştî bêhtir hatibe pelçiqandin her wiha bûbe bi qurban. Û ta radegê jî mirovê Kurd ji hestên bi zimanê xwe hatibe bi dûrxistin. Digel ku mirovê Kurd, dawîya dawî, şîya nasnameya xwe ya netewî bi parêze jî, li di warê ziman de, ta qonaxêke pir balkêş ew proje û pîlan gihîştine armanç û mebestên xwe.

Îro dema ku em nêzikahiyê li dergehên sala 2000 an dikin hêjî termê "Kurmancî" li ser milê me ye. Kê Kurmancî kuştîye û sedemên kuştinê pêdiviyî gûftugoyê û ronî kirinê nakin, çinkî pisîka Kurd jî vî tiştî dizane. Lê "silav li sifra hazire". Tiştî herî giring ewe: Ma gelo em dê çawan bişên wî termî ji nûve vejînin, em dê çawan bişên sosreta ku bi serê Kurmancî hatiye dest nîşan bikin, ku Kurmancî li xwedîyê xwe vegere û ji şûnşopa kuştinê dawesînin?

Ne xwe em nêzikahiyê li sala 2000 an dikin û zanistiyên zimanî sînoren matmayîne derbas kirine.

De Saussure û Chomsky ta Rolan part û levy chetraos û ji destpêka vê sedsalê de bi dehan rêbazî û teoriyên xweser ên li ser ziman hatine avakirin.

Îro... serencamên lêkolîn û pêşveçûyîna zanistîya zimanî "philologya" mezintirîn û aloztirîn bersivên pirsgrêkên jiyana mirov û civatan didin.

Li ser bingeha jihevixistin " synthesis " û lihevsiwarkirina peyv û wişe û hevokan beşîne taybetmend ji felsefeyê hatine berceste kirin.

Herweha nûjentirîn û balkêştirîn teoriyên rexnegiriya vê demê xwe dispêrin ser rola zimên û ser rad û sewiyeta hûnandin û şeweyê bikaranîna zimanê afirandin û dahênanê.

Bi rawestana lînik û li ser jêder û kok û reseniya ziman, îro, bersiva "ji ku hatin" û "bi ku de çûn" û çarenûsa mirov tête dayîn.

Herweha, dema ku zimanzanan berê xwe dan naverok û mijar û "structura" zimên, şîyan pirsine nuh ku girêdayî bûn û nebûn û jiyane ne, biafirînin, pisên şaristaniyê, ên dirokê, ên civatê û rewşenbiriye...

Îca di despêka vê serdemê de wexta ku "philologya" dest bi xweserî û teqîna xwe kir û bû zanist, di cih de dergehên xwe ji wêje û huner û afirandinê re vekirin. Bi wê vekirinê re gelek bîr û bawerî teqiyay û gelek jî ji nû ve ji dayik bûn. Ji xwe Formxwazên Rûz û xelesa Bragê encamên wê teqînê bûn. û pê re teoriya edebî û diroka edebî û rexnegiriya edebî jî bi pêş dikevin.

Lê pîrsa serekî a ku xwe çem dike hişê mirov û dikare mirov radeşt û bê hevî bike eve;

Ma gelo çihana rewşenbîrî û tevgera wêjeyî ya kurdan, herweha nivîskarên ku îro alên edebiyata kurdî ya nûjen(!) bilind dikin, û zimanzan û çend niv-zimanzanên kurmanciya pişt şikestî, hetanî kîjan radê sudeke zanistiyane ji vê şoreş û rêbaziya zimanî wergirtine ango hetanî kîjan radê şîyane lêkolîn û pirtûk û kovarên xwe di bin akama vê rêbaziye de biafirînin...Mebesta min ne ew e çima Kurmancî jî ne xwedî filesof û zanyar e, bi qasî ku çima bi şeweyekî zanistî û bi alavên zimanzanîne li ser alozî û astengên zimên nayête rawestan?!!

Ji bo ronîkirina vê pîrsê û ber bi çavkirina çend xalên giring di çihana wêje û kurmanciya îro de, emê di hejmara dahatû de hewil bidin ku tiliya xwe deynin ser rastiya çend birnan.

Ehmed Huseynî

Bi destê min girt: Kurê min hela were li gel min. Hin ji giraniya xwe spart ser min û em bi rêve çûn.

Min jê pîrsî: Bi ku de Apo?

-Ber bi goristanê ve... qefdek kaxez li wir e, ji mêj ve bendewariya te dike... Ma tu li kuderê bûyî, ez ji hilgirtina wan westiyam, min ew danîne ser gora xwişka te, min ew di nav stîrî û kêla gorê de veşartine. Ez li te kerr û gêj bûm, ji geryanê pîr westiyam.

-Ez li gel Cegerxwîn bûm. Me sînör birrî, min bi çavê xwe dît ku çawan leşker "lorca" dikujin, li wir; linik wê gola nêzî tixûbên Amûde. Werz bédeng bûn. Darên bi'îvan wek mijê spî bûn. Ez jî bi te diramîyam Apo. Vehesîna wê niveroja li gel te hat bîra min, dema te min himbêz dikir, dema te laşê min î piçûk bi 'eba xwe dipêça. Sira bayê em derbas dikirin, îca em diketin xewê Apo!..

Di wan kolanên dirêj de me birêveçûna xwe berdwam kir. Ez derbasî tengerêyekê ku bi şengebiyan hatibû dorpêçkirin, bûm.

Taristanê xwe berdabû ser koşeyan, dema ku em durrî çiran diketin sîbera me dirêj dibû.

Em li ser kenarên goristanê rawestiyam. Apê min destên xwe ber bi jor ve bilind kir, kir kurtepîst û got:

-Anuha mirî tî dibin.

-Kî dê avê bide wan?

- Ne kes.

Goristanîne bi tof, lerzekê gewriya min dagîr kir. Apê min dev ji min berda û ez bi tena xwe mam, wek hesinekî min berê xwe da tengerêyan, gîhayê havînê di bin lingê min de şikest, ji durr, min dengê gullan bihîst, esman çirand, tîbûna mirîya li jêr lerza min çirand.

Bêrîkirina xwe ber bi te de dehf didim û hehecikên xwe ber bi tîlan ve. Wek roavahiye bi ser singa te de pêlan didim. Peşkên pêşîn ên baranê porê te şil kirin. biskên reş bi şewqa neynîkek nû tevlihev kirin. Tu xweş bû û bi gunehkariyê gevizandi bûyî. Min tu himbêz kirî, min piyên te yên hevgerî wêkî gilokekê ji birûskê guvaşt. Min rûyê te ber bi esman ve bilind kir û min serê te ê qereçiyane spart milê xwe. Ez bi goştê bawerdar û bi hêrsa bêrîkirinê hatim nixumandin.

Ez sînga xwe ber bi te de dehf didim, îca bi benderan mişt dibe. Gerek bû ez bi ewlebûn di goristanê de razabûma. Bagerên te li min dixin, wek balendeyekî serjêkirî diperpitim. Dilpên xwe bi ser ronahiya te de dirîjim. Ez bêrîkirina xwe ber bi hebûna te de dehf didim û mêraniya xwe ber bi hevşên kevnar de, wek dayika xwe dema ku min wenda kir, digirîm. Bi şarezayî 'eba xwe li giyanê xwe rapêça û bi hêsiyan hate dadan...Hêsiyan ku ji wê deqa veşartî ya ku herdem min jê hez dikir, diherikîn. Birêveçûna min jê diherikî, weku çawa ez di êvara dawîn de ji giyanê wê herikim. Min lingên xwe ber bi daristan û golan û sazbandên gerokî ên baja-

Beşek ji romana M. Efîf Huseynî

Tîbûna miriyan

M. EFİF HUSEYİNİ

rên mezin ve berdan. Min qefdek mezin ji kaxezan hildigirt, gerek ez, wan ji rêwiyan re, ji penaberan re bix-wînim.

Hespên birindar li wir in û zîqe zîqa tivingên (SE'DO) di berbangê de û terkên ku piştî çend rojan di golê de diyar bûn, binê golê ji kîlê bû û ji şûna nîlufera tîr tûtîn û nehênîyên zilaman bû.

Ez ji hev diketim. Ez nalîna xwe ber bi bendergehên şîn ve dehf didim. Li beramberî toza penagehan dipûnijim. Ez zelûliyê, ji birkirinê ji ser dadiweşînim.

De li ser wan êvarên giran ên li wir ne peyiv!

De li ser darên zeyzefûnan ên wekî jinan ne peyiv!

Ez li ser êvarê wek mîrekî surgûnkirî rûdinê. Ez sînga xwe ber bi baranên te ve dehf didim. Û ez bi ser goştê te de, goştê har, dikevîm.

Dema ku derbas bûn, dayika min kulîkên xwe ên havînê av dida, û li ser zarotiya me dikir pite pit...

Bîna êvarê û barûdê ji wan difûriya.

-Ey Mîrên min...Ey Bedirxanîno, ser sera û ser çava.

Ji ser kum û kolozên xwe toz dadiweşandin, rihên xwe ên şîn mist dan, serê xwe berdan ber xwe û ber bi hundir ve derbas bûn.

Bi bédengiya xwe cî dagirtin. 1898..Qahîre

Di tax û kuç û kolanên Qahîreyê de Bedirxanî liviyam. Derbasî mizgefteke Fatimî bû. Cejn di roja xwe ya duwemîn de bû, bi bang û tekbîran re kêfxweş bû. Çend kêlik bihurîn û neşîya

dengê dayika xwe bi bîr bîne. Li busê siwar bû û berê xwe da IS-KENDERİYÊ. Di cih de çû ber bi perraevan de. Li wir keserek veda...Xwest bin-av bibe, xwest li pêşya keştiyên kevnar xîne...Li rexê dîtir...Li cîhê durr, ŞÊX SEİD bi sêdarê ve li ba dibû.

-Ax..xwezka anuha tu ligel min bûya, Ey ŞÊXÊ n.in î giranbûha.

Hêdî hêdî zivirî, li paytonê siwar bû û berê xwe da İstgehê. Li Qahîrê dest bi tîpên latîni kir. Derbasî rûpelên zer bû. Wek mûmekê ew li laşê xwe pêçan û d e s t b i nivîsandinêkir...Ûnivîsand..Nivîsand and...Nivîsand



Di hejmara bê de:

- Xewnek "Çîrok" Nizar Agrî
- Kevirê Rokê "Helbest" Oktavio Paz
- Kurmancîzanên îro" nêrîn" Ehmed Huseynî
- Pîne -name-Deq- Azad Ehmed Elî

Çîrok

Xewneke xweş

Diyarî ji zeriyan gundê *Maşoqê re, yên ku bi jiyane şa nebûn...

Kamiran Hajo

Li piyala çayê nerî, qetek nanê tenûrê jî di berde, bê dilê xwe destê xwe avête nê, parîk jêkir, avête devê xwe û bi giranî cût, çayê bi ser de kir, bi zorê qurpand.

Ji Jînê re bûbû kul ku carekê ji bilî çayê û nan, tiştêkî di bi taştîya sibehê re hebe, lê dîtina wê ji rewşa malê re ew bê deng dikir.. Xurîniya xwe şikand, rabû ser xwe ji mal derket.

Sibeheke payizî ye, bakî sarî tê, pelên daran yên zer û hişk diweşîne..kêlik ên dawî ne ji jiyana wan pelan re, bi nermî û nazdarî ji banî tene xwar, weke ku bi fedîbûn xatiran bixwazin...Rê didine daran ji bo pişkiwîneke nû, jiyaneke nû şûna mirinê bigre..



Jînê berê xwe da xaniyê li kêleka gund, ciyê kombûna palên pembû. Roja dawî bû ku Jînê û keçikên gund diçûne çiniña pembû..ji ber vê yekê jî bi xweşbûnekê dihis. Giha civanê xwe, hîna pale hemû nehatibûn.

Kirasê Jînê yê tenik ew ji sira wê sibê nediparast, lewra li ber diwarê xanî li qelêvîska bédeng rûnişt, serê xwe kire nav kabokên xwe de û xwe pevve guvaşt. Tavika serê sibê, li ber wî diwarî ew sist kir û hişê wê hêdî, hêdî kete xeyalan..

Hate bîra wê ku daweta hevalê wê nêzik e û ji bo vê yekê piştî perên xwe bistîne, wê kirasekî nuh bikire, kirasekî bi gul, rengî, li ber ronahiyê bi çirîsîne, çavên xortan bi alî Jînê de bikşîne û dilê wan bi-êşîne..Lê ji xwe re got, ne dil û çavên xortan, lê dilê Şêro bi tenê..tanî ber çavê xwe, bê çawa wê di govendê de, bikeve destê Şêro, ji xwe re digot: Ezê bêjime xwişka wî, hevala min e, ku here bikeve destê wî, ezê dûvre kevime destê hevala xwe, piştî kêlikê bera hevala min govendê berde, wê çaxê, ji neçarî!! ezê destê wî bigrim.

Bi van ramanên dawî tevzî-nokan laşê wê girt û bi xweşbûnekê hisa...

Lig-liga kenekî ew ji ramanên wê şiyar kir, serê xwe hilda, dît ku Rewşê û hevala xwe dikenin. Rewşê riwê xwe bi dermanan seyandibû, di dil xwe de xwe xweşik kiribû. Bi nav pale ye, lê ya rast ew e ku ew tu karî nake..ji ber ku serêkê palan dil tenik e û Rewşê jî comerd e..!?

Jînê bi xemsarî berê xwe ji wan guhert û serê xwe dîsa kire

nav kabokên xwe de, xwest ku careke din bikeve nav xewnên xweş de..

Wê perê min têra kirasekî û soleke nuh, pehnî bilind, bikin..belê destmaleke nuh jî gereke, naxwe divê ez ji hemû palan çelengtir bim, bi rastî jî, di hemû rojên burî de min tu kêmayî nekirîye...Hinek dermanên xweşikbûnê jî gereke...Lê ez wan tiştan hemûyan bikirim, ez ê çi dime malê..? Li vir Jînê pê hisa ku dixwaze keserekê berde...

Bavê min û birayê min jî kar dikin, ewê têra malê pera binin..Bi vî rengî Jînê bawerî ji xwe re çêkir...Bi rastî desmala minî kevin jî hîn baş e, dermanên xweşikbûnê jî ne hewqasî gerek in....

Ew di van xewnan de, pîkab hat, pale ketne paşîya wê, ji ber giraniya palan, paşîya pîkabê hate xwar. Rewşê bi tenê li pêş, navbera ajovan û serêkê palan de, siwarbû. Bû kurtepista hinekan, weke her

roj û hinek di ber xwe de kenîn. Jînê li kevîka dawîya pîkabê şipiya ma, bi destê xwe hesinê pîkabê girtibû...

Pîkab bi rêket, bayê sar bi lebtê re sartir bû, lertzînok bi laşê Jînê hatin, rabû destmala xwe li milê xwe pêça û pora wê ya himbiz û reş li ber bê ket. Bêvila wê ya kin û xweşik û lêvên tenik li ber wî bayê sar sorbûn, tiştê jê hat xwe pev ve guvaşt û xwe nêzikî hevala xweyî di rex xwe de kir...

Wêneyê wê bi kirasekî nû, rengî û çirîsî di govendê de, di destê Şêro de, ji her çavên wê neçû. Destê Şêro destê wê diguvaşt û geh nequşk jê dida, wê jî carna bi guvaştina destê Şêro xwe sist dikir, carna bersiv bi guvaştinekê ji destê xwe dida, carna jî bi kenekî bin lêvan re..û dawî....Ew dawet dibû daweta wê û Şêro....

Bi qirîna keçikan û zemûrê kemyon û pîkabê re, Jînê ji xewnên xwe şiyar bû, lê belê şiyarbûna dawî bû..kemyona bêbext û ajotina ajovanê ku Rewşê di rex de, bûne sedemên kambaxîke mezin....

Xewnên Jînê bi rewanê pak re, bi ezmana ketin, belav bûn, ji bara hev ketin..

Jînê bi laşê xwe ve bin erd bû, lê xewnên wê ji azmana hatne xwar û di kulekên xaniyên xizanan re derbasî hundir bûn, bûne mêvanê keçikên nûhatî, yên ku xweş bawer dikin, ku bi kedê de van xewnan pêkbûn...

* Maşoq: Gundekî Kurda ye, dikeve bakur-rojhilatê Qamişlo bêtirî 40km dûrî Qamişlo ye..

Kevirê rojê

OKTAVIO PAZ

Şengebiyek kiristalîn, spîndarek avîn. Bayî nafûreyeke avê î bilind çemandiye. Dareke reh daçikyayî digel ku bi samagerî xwelibadike birêveçûna cokedê, dizivire, pêş de diçe, paş de vedigere, diçive û herdem dighêje:

Birêveçûnek aram ya stêrkekê an ya biharek ne bi lez, Avek xilêfk girtî li seranserî şevê pêşzanîn jê dipijiqin Amadebûnek giştî di xirecirê de, Pêl lipê pêlê hetanî nixumandîna her tiştî Şahînsahiyek keskin serê şevê nas nake, wek çurîsîna baskan dema ku di dilê asman de tê raxistin,

Birêveçûnek di nava derk û dehla rojên dahatû re û şûma pirîska bêoxiriyê wek balendeyê ku daristana xwendina xwe dike kevir, û dilxweşîya nêzîkbûyî ya ku di navbera çiqulan de tar û mar dibe, Katîne ronak in, balendeyan dest bi nikulandina wan kirine, Fal e ji nav tiliyan diflîte,

Û amadebûnek mîna stiranek bêagahî mîna ba ku di şewatekê de diflîne Awîrek, cîhan bi derya û bi çiyayan ve helawistî dihêle Laşekî ji ronahiyê di bêjîngêk lalîn de, Du rehnên ji ronahiyê, zîkekî ji ronahiyê, kendavine piçûk, Gaberdeki rokîn, laşek di rengê ewr de, Rengê rojekê ku bîlez xwe çem dike, Katîmêr diçurise û di laşekî de bi cih dibe Anîha cîhan di laşê te de têt dîtin, Cîhan di tenikbûna te de tenik e,

Wa diçim nav tengerêyên awazan, Ji navbera anihayên zîngê zîngê diherikim, Wek korekî di nava tenikayiyê de dibuhurim, Rengvedanek min dîkuje, di yek dîtur de ji dayikî dibim, Ax hey daristana stînanê efsanewî, Di bin kevanên ronahiyê de derbasî tengerêyên payîzek tenik dibim,

Di nav laşê te re dibuhurim mîna ku di nav cîhan re, Zîkê te panavek hetavîn e, Memikên te du kinîşt in ku xwîn şahiyê bi nehênîyên xwe î hevîl re dike, Awîrên min wek lavlavê te dinixumînin, Tu bajarekî bi deryayê dorpêçkirî yî, Tu sur î, ronahiyê, ew kiriyê du beşên di rengê xoxê de, Tu ciwar î, bo xwê, bo tehtê, bo balendeyan li jêr rêberiyên nîveroja tereşmanbûyî,

Rengê arezûyên min li xwe kirî ye Wek ramana min tu silfî-tazî bi rê dikevî, Di nav çavên te re dibuhurim weku di nava avê re, Pîling xewnê ji van herdu çawan vedixwin, Genim di vê pirîskê de dişewite, Di nav eniya te re dibuhurim, weku di nav heyvê re weku ewrekî di ramana te re, Di nav zîkê te re dibuhurim weku di nava xewnên te re, Kirasê te î ji garis pêldide û distirê,

Kirasê te yê ji kiristal, yê ji javê, Lêvên te, porê te, awîrên te, Li seranserî şev û rojê tu baran î, Tu sînga min bi tiliyên xwe î avînî vedikî, Tu çavên min bi lêvên xwe î avînî digirî, Tu li ser hestiyên min baranê dibarinî, Û di sînga min de darek rihîna e rehên xwe ên avînî radiçikîne,

Di nav bejna te re dibuhurim, weku di nava cokedê re, Di nav laşê te re dibuhurim weku di nava daristanekê re, weku di çiyakî re, weku li ser rêcekê ku ji nişkê ve digihîne dolek pîr kûr, Di nav ramanên te yî narîn re dibuhurim û ku ji eniya te yî sipî derdiçim sîbera minî bazdayî diherife, perçeyên xwe yeko yeko kom dikim bê laş rêça xwe didomînim, bê serûşîn digerim,

Tengerêne bê kutayî di bîrê de, dergêhine vekirî bi ser hêwa nek vala de ku demsalên havînê genî dibim, ku gewherên sîbûnê di hindirê wê de diçurîsin, Rûyek, nebedî dibe, hema ku tê bîra min, Destêk, wenda dibe, hema ku ez bihingivemê, konikne pîrê gîjo mijî li ser bişîrîna ku ji rabirdû xwe li badikim.

(Dûmahîk heye)



Kevirê Rojê: Yek ji xweşiktirîn û ji bi navû-dengtirîn helbestên O. Paz e. Di sala 1957'an de, bi şeweyekî destanî û bi xwesipartina li ser sembolên salnameya kevna a Meksîkê, ev helbest nivîsandîye.

Di vê helbestê de O. Paz xwe dide ber pêlên dîrokê û di derya bêrikirina demên kevna de bin av dibe. Helbestê ji raman û bireweriyana rut dike, daku peyv û ûşeyan bi firê xîne û esmanê stiran û ahangên berfirehtir bike. Her wiha li ser rîtmîna bûneweriya xewn û arezûyan, sirûd û diflokên nemir di afirîne. Li me vedigere, toza qalind ya dîrokê ji ser hest û mêjiyê me dadiweşîne da ku me-wek mirov-jî her tiştî cuda bike. Destên alîkariyê dirêjî me dike ji boyî ku em bi tenha xwe ligel xwe û ligel pîrsên xwe nemînin. Dema ku li ser paşerojê dipeyîve me bi alî pêşerojê ve dehf dide û dide xuyanî kirin ku çawan insan bûnewerekî giran buha û payedar e. Wergerandina (kevîrê rokê bo xwendevanên helbestê dergêhê derbasbûna nav jiyana O. Paz bi xwe ye jî; Jiyana pîr alî û ber-fireh.

Bê guman Wergerandina hel-bestê nokeriyeke mezin e, hem bo helbestê û hem jî bo hel-bestvan bi xwe. Lê ez dixwazim bidim diyarkirin ku ê me, tenê me hewl daye ku em helbestê di kirasekî Kurmancî xînin. Çûnkî wergerandina helbestekê mîna helbesta "Kevirê Rokê" barekî pîr giran e bo sewiyeta Kurma-nciya îro.

Bi hêviya ku rojekê ji rojan zîmanê me asoyên xwe biçîrine û wergêrekî di bikaribe vê helbestê -wek deq-wergerîne Kurdî

DERHEQÊ MELA EHMEDÊ XASÎ DÎ

MALMİSANÎ

"Qewmêk eke bêkitab bo Dewarê bêziwanî maneno" Ehedmedê Xasî

Melayê Xasî Mewlûda Zazî Bi zarê Zazî çekirîye, ne Tazî Cengnama Kurd û Ermen nivîsî Wek agir berdî me diîsî Cîgerwxîn

Ehedmedê Xasî, şairêk welatperwer ê Kurdan o ki raya (fina) ewilî -1898 di- ebi lehça Kirdkî (Zazakî, Dimilkî) yew mewlud nuşt. Yanî kitabo Kirdkî yo ki verê verkan nusiyawo ebi destbê yê nusiyawo û no kitab 1899 di Diyarbekir di metb'e'a ro gunawo (çap biyo). Ehedmedê Xasî gore, qewmo ki wayîrê kitabî nêbo, dewarî maneno. Dewarê bêziwanî!

Çend serrî ra ver mi no mewlid herfanê 'Erebkî ra tadabi herfanê Latînkî ser û 1985 di ebi elfaba Kurdkî ya ewroyinî kovara Hêvî di dabi çapkerdîş (1).

Ehedmedê Xasî ebi Kirdkî, Kurmanckî (Kirdasî), Tirkî û 'Erebkî zewbî şûrî zî nuştî. Yew şûra yê ya Kurmanckî ya ki M. Licokic'î mi rê erşawita (riştâ) ma na hûmari di çap kenî. Zeki şûra Cîgerwxînî ya corîni ra fam beno, Melayê Xasî, Cengnameyê Kurdan û Ermeniyân zî nuşt, heyf ki no cengname destê ma di çino û ez bi xwi nêzana ki no ebi Kirdkî yan ebi Kurmanckî nusiyawo, watişê Zeynelabidîn Zinarî gore no cengname Kirdkî biyo.

Mi derheqê Mela Ehedmedê Xasî di him hûmara çarîna kovara Hêvî di him zî hûmara diyina kovara Devrimci Demokrat Gençlik di (Adar 1978) tanî me'lûmat dabi. Labelê nê me'lûmatî di -ki tanî mêrdiman dabi mi- şaşey zî estî. Ez wazena tiya di nê şaşanê xwi raşt bika. Mesela mi nuştbi ki o serra 1863'di Hezan di marda xwi ra biyo, labelê tezkîreyê cêrênî ra fam beno ki no tarîx şaş o (Tezkîrewo ki ez behs kena û şima fotokopiya yê tiya di vînenî, M. Licokic'î mi rê erşawito, Hûmay yê ra weş bo). Nê belgeyê Tirkî di nuşt wo ki Ehedmedê Xasî [1]283 di marda xwi ra biyo. Zanayîşê mi gore no tarîx Rûmî yo û tarîxê Miladî gore 1867-1868 o (eke Hicrî bo 1866-1867 o). Yanî merdim şino (eşkeno) vajo ki Melayê Xasî 1867 yan zî 1868 di daykda xwi

ra biyo. Nê tezkîreyê Ehedmedê Xasî gore, nameyê pêrdê yê Hesên o, Hezan di marda xwi ra biya, Îslâm o, zevciyaye wo, beşna yê miyanî ya (ne derg ne kilm a), çimê yê şalên î, rengê çermê yê zey rengê genimî (xelî) yo, wilayetê yê Diyarbekir, qezayê Licê, dewa yê Hezan o, numreyê banê yê 49 o. No tezkîre bi xwi 29 Mart [13]37 di yanî tarîxê miladî gore 1921 di nusiyawo.

Zaniyêno ki karbidestane Tirkan, 1909 di Melayê Xasî Diyarbekir ra surgunê Rodos -a ki Deryayê Sipî di ya- kerdo. Yê demeyêk muftûyeya Licê zî kerda (2).

Herçiqas tanî nuştuxan nuşt o ki Ehedmedê Xasî 1950 di (3) dinya xwi bedilnaya (şiya rehmet) zî, raşt niyo. Yê 18. 2. 1951 di dinya xwi bedilnaya.

Ehedmedê Xasî yew şûra xwi ya 'Erebkî di behsê Mustefa Kemalî zî keno, vano:

"Qîdwetu'l-Etrakî turren el-musemma bi'l-Kemal Kane me'nahû zewalen, fi'z-zewalîn fi'z-zewal"

Yanî: "Serekê Tirkan, nameyê yê Kemal Me'na yê qediyayîş, qediyayîş di qediyayîş bi"

Çend qismê yew şûra Tirkî ya Ehedmedê Xasî zî wina yî (4):

BENZER

Bir kavm kitapsız olsa Dilsiz davara benzer. Dinsiz hayat-ı fanî Yazsız bahara benzer. Adil olan mübarek Ebru-yi yara benzer. Zalim olan kimesne Çehre-i mara benzer. (...)

Alim olan münevver Bütün envare enzer. Cahil olan zavallı Mumsuz fenere benzer. Kelâm-ı hikmetimiz Misk-i Tatara benzer. Hasî, makal-ı sadık Şems-i nehara enzer.

Eke ma nê vatanê Xasî tadî Kirdkî, o wina vano:

MANENO

Qewmêk eke bêkitab bo Dewarê bêziwanî maneno. Heyato fanîyo bêdîn Wesarê bêaminanî maneno. Muberako 'adil Birewanê waştâ maneno. Keso zalim Şeklê marî maneno. (...)

(1)Hêvî (kovara çandîya giştî), Paris, no: 4 (İlon 1985), r. 75-97 (2)Şevket Beysanoğlu, "Ahmed-i Hasî", Zîya Gökalp, üç aylık kültür dergisi, Ankara, no: 60 (Aralık 1990), s. 69 (3)Şevket Beysanoğlu, nuştewo corîn, 69 (4)Şevket Beysanoğlu, nuştewo corîn, 70

DEVLET-İ ÂLİYE-İ OSMANİYE TEZKİRESİDİR

Kıymeti on kuruş alınmıştır/29 Mart [13]37 [1921]

İsim ve şöhreti: Ahmed Pederî ismiyle mahall-i ikameti: (...) * Hasan Molla (?) Osman Validesi ismiyle mahall-i ikameti: (...)

Tarih ve mahal-i veladeti: 283 Lice Hezan karyesi, iki yüz seksen üçdür

Milleti: İslâm San'at ve sıfat ve hizmet ve intihab salahiyyeti: Müteahhil ve zevcesi müteaddid olup olmadığı: Bir zevcesi olduğu

Derecât ve sunûf-i askeriyesi: Eşkal Boy: orta Göz: elâ Sîma: buğday Alâmet-i farîka-i sabite: tam

Sicil-i Nufusa Kaydolan Mahalli Vilayeti: Diyarbekir Kazası: Lice Mahalle ve karyesi: Hezan karyesi

Sokağı: Mesken numrosu: hane 49 Nev'-i mütemekkin: hane

(...) şöhret ve hal-i ikameti muharrer olan (...) Hasan (...) Osman oğlu Ahmed, Devlet-i Âliye'nin tabiiyyetini haiz olup ol suretle ceride-i nüfusda mukayyed olduğumu müşîr işbu tezkîre (...) kıldm.

*Cayê ki nêwanîyay mi ebi hîrê nuşteyan (...) misnay (nawîtî).

Şİ'REKE MELA EHMEDÊ XASÎ YA BÎ KURMANCÎ

Min du şî'rên şairê Kurd, Mela Ehedmedê Xasî di 1992'yan de ji devê Mela Ehedmedê Se'diyê nivîsandibûn (Ehedmedê Xasî, Mewlûda Kirdkî -yanî Zazakî-nivîsandiye). Paşê min ev şî'r nîşanî kek M. Emîn Bozarslan dan û derheqê hin beşên wan de jê agahdarî xwestin. Piştî xwendina van şî'ran kek Bozarslan diyar kir

ku ev ne du şî'r in lê şî'rek e. Hin beşên ku di vê şî're de kêmbûn û hatin bîra wî jî wî lê zêde kirin. Herweha hin beş û gotinên vê şî're ku baş nedihatîn fêmkirin, wî bi jênotan îzeh kirin. Ez jîbo alîkarî gelek sipasî kek M. Emîn Bozarslan dikim.

M. LICOKIC

DÎRÊJ KE XASÎYA

Dirêj ke Xasîya, nezmek cedîde (1) Di piştê çend selam û çend tehiyyat (2) Li ser Karaziyê ku nav Se'îd e (3) Dixwîne ew jî ber Încîl û Tewrat

Li textê xwe ku rûnê qeyser e ew (4) Li hespê xwe siwar be 'Enter e ew (5) Di seyra roj û şev Îskender e ew (6) Bi wechê xwe li Cahiz büye deh qat (7)

Lehû wechun 'ebûsûn qemterîra (8) Lehû şeklun yumasîlhu'l- be'ra (9) Lehû xeddun yucanîbhu'se'îra (10) Huwe'l-kabûsu beyne'n-nasî bîzzat (11)

Gele qazî û miffiyê qeza me Bizanî ev Se'îde sextenama (12) Bi nisbet me ji ewwel ve xulam e (13) Eger şahid dixwazin, Hewr (14) û Şeqlat (15)

Li nik îmamê Dêrûnê û Hûrê (16) Nikare yek nefes pîf ke bilûrê Dixwe sondê bi Tewrat û Zebûrê: "Ez im îro Herîrîyê Meqamat." (17)

Belê de'wa diket ku: "Şa'îr im ez Di 'ilm û hem edeb de mahîr im ez (18) Bi hukmê Îsmê E'zem qadîr im ez (19) Bi firek ji Cûmê herme Cûmat." (20)

Qe ne b'xêr be, Se'îd îsal li mal e Büye me'mûrê exnaman îsale (21) Çiqas kûsî û kêrgoyên li pal e (22) Dibê "Qaçax e, bigrin, bermedin, hat!"

Bes e Xasî, bîra xame xeber de (23) Se'îd bû bûk û şaşik kirye perde Ji rî hona kezî, kom kir li erde Li ser eqda nîkahê maye ew mat (24)

Eger bêjin "Nîkaha wê li kê bû?" Dibêjin "Aşîqê Fexrî Begê bû." Fexrî Begê go "Sûcê şaşîkê bû Mi go qey Nazlîxan e j'perde da hat."

Bes e Xasî, Se'îd mîrê melan e Welê aşîq büye l'keçkên Filane (25) Nikare zeft ke bonciyên qulane Welew sancûl bikî wan tu ji polat (26).

(1)nezmek cedid: helbesteka (şî'reka) nû (2)tehiyyat: "Piraniya 'tehiyyet" e, ew jî bi mena "silav" e. (3)Karaz: Gundeke Licê ye. Se'îde ku ev helbest li ser wî hatîye nivîsîn, jî wî gundî büye û jê ra hatîye gotin "Se'îde Karazî". (4)qeyser: împaratorê dewleta Bizans (5)Enter: Mîrxasêkî Ereban büye. (6)seyr: meş, meşa li rê (7)İskender: İskenderê Makedonî ku di nava Kurdan da jê ra tê gotin "Eskenderê Romî". (8)wech: rû, şinçe Cahiz: Nivîskarekî Erebe ê navdar büye; di navbera salên 775-868'an da li Besrayê jîyaye; yek ji pêşewrên edebiyata Ereban büye; gelek jî û zana büye; li ser babetên cure cure gelek pirtûk nivîsîne. Lêbelê bi şinçe û rûyê xwe gelek zîşt (çirkîn) büye; wisa zîşt büye ku büye nîşan û sembola zîştîya rûyan. Hozanekî Erebe di heqê zîştîya wî de gotîye "eger beraz careka di jî bihata mesixkîrin, dîsa jî bi zîştîya xwe de jî Cahiz kêmtir büya". Di heqê zîştîya wî da ev meselok jî heye: Jinek çîye nik ayînxêzek (ressam) û jê xwestîye ku jê ra ayîna (resim)şeytên çêke; ayînxêz gotîye "Min şeytên nedîtiye, ez nizanîm çawa ye, ez nikarîm ayîna wî xêz bikim û çêkim." Jinik bi xemgîni jî dikana

wî derkefiye çîye û li rê rastê Cahiz hatîye; hema destê wî girîye û ew kaş-kaş kirîye, birîye dikana ayînxêz û gotîye "aha şeytên ev e, de lê binêre û jî min ra ayîna wî xêz bike". Di vê helbestê da Melayê Xasî, rûyê Se'îde Karazî jî rûyê Cahiz deq qat zîştir û xirabîr nîşan daye.

(8)Yanî "rûyê wî gelek dijwar e û mîrtal e, mîrê wî tal e".

Ev malik û her sê malikên li pey wê bi zîmanê Erebi ne.

(9)Yanî "deve dişibe şeklî û awayê wî, şeklî û awayê wî wek şeklî awayê deveyê ye".

(10)Yanî "dêmen wî wisa nin ku cehennem jî wan dîr diçe, cehennem xwe jî dêmen wî diparêze".

(11)Yanî "kabûsî di nava mirovan da ew bi xwe ye".

(12)Sextenam: Navsextê. Navê "Se'îd" bi mena "bextyar" e; ku ew nav sexte û qelp be, dibe "şeqî", ew jî bi mena "xirab, bêhext, gunehkar" e.

(13)bi nisbet me: li gora me.

(14)Hewr: Gundeke Licê ye.

(15)Şeqlat: Gundeke Hênê ye, jê ra tê gotin "Şeqlat" jî.

(16)Dêrûn û Hûr: Du gundên Licê ne.

(17)Herîrî: Nivîskarekî Erebe ê gelek navdar büye; di navbera salên 1045-1122'yan da jîyaye; li Besrayê xwendîye. Pirtûka wî ya bi navê "Meqamat" gelek navdar e û di edebiyata Erebi da çîyekî gelek bilind û girîng girîye. Navê wî bi temamî Qasim bin 'Efi el-Herîrî ye.

(18)edeb: edebiyat mahîr: jêhatî, hunermend, kêrhatî

(19)İsmê E'zem: Navê Xwedê yê mezîntîrîn. Li gora bawerîyê, kesê ku wî navî bizane dikare kerrametan nîşan bide, mesela dikare bifire. qadî: tuwana, kesê ku dikare tîştan bike, kesê hêzdar û xwedîqadret

(20)Cûm: Çîyekî nêzê Licê ye. Cûmat: Gundeke Hezroyê ye.

(21)Memûrê exnaman: Karbidestê ku pez û dewarên xelkê dijmartin û qeyd dikirin û bi Daira Malîyê didan zanin; wê daîreyê jî li gora wan qeydan jî xwedîyên wan pez û dewarên beş (vergî) dixwest û distand. Li hin hêlên Kurdistanê xelkê tinaz bi wan dikir û jî wan ra digot "kerjûmêr".

Semedê ku Melayê Xasî ev helbest li ser Se'îde Karazî nivîsîye jî ev büye ku Se'îd dema me'mûrê exnaman büye, sê bizinên Xasî li derê gund ditîne û gotîye "ev qaçax in" û ew di deftera xwe da qeyd kirine; bi wî awayî Melayê Xasî mecbûr maye hem beşa wan daye, hem jî jî ber ku berê ew nedane nivîsîn, ceza daye.

(22)kêrgo: kerguh, keroşk


(23)xame: qelem

(24)eqda nîkahê: bîrîna marê, marbîrîn

(25)File: Kesê li ser dîne İsa, Xristîyan. Li Kurdistanê bi piranî jî Ermeniyân ra hatîye gotin "File".

(26)Sancûl: Ben yan zincîra ku dikin stûyên kûçikan û wan digerin. Di peyveka pêşîya a Kurdî da tê gotin "xweşkiya se ew e ku di sancûlê da be".

Polat: Pola. Xasî xwestîye beje ku "wewlew ku tu sancûlên bociyên qulan ji pola jî çêkî, Se'îd wisa bêkêr e ku nikare wan zeft bike."




Mirina dayika Muxlîs û Xelîl
XEZNA

Ji bo me nûçeyeke pir dijwar bû
Bi vê munasebeta xemgîn em sersaxiyên xwe pêşkêşî, Apê
Şexmûs Xelef û zarokên wî Muxlîs, Xelîl, Kawa û
xwişk û mirovên wan dîkin.
Bi hêviya ku ev bûyer dawîya şîniyan be.

Hevalên Xelîl ên li Swêdê

Ji bo hevalê nemir
Av. Ahmet Karli



Hevalê me yê hêja, têkoşerê welatparêz, endamê
Hevgirtin-PDK Ahmet Karli di 7'ê Sibata 1994'an de
ji nav me barkir çû heqîya xwe.

Ahmet Karli ji salên 1960'î vir de di nav tevgera
Kurdî de cih girtibû; yek ji damezrêner û
berpîrsiyarê DDKO ya Stenbolê û herweha
damezrêner û endametiya Komîta Navendî ya
KIP'ê jî kiribû.

Piştî 12'ê Îlonê wek gelek rewşenbîrên Kurd bû
mihacir û li Parisê cîwar bû. Û endamê Enstituya Kurdî ya Parisê bû.

Ahmet Karli di van salên dawîn de ji bo xurtkirina hêzên welatparêz, di
pêvajoya yekîtiya rêxistinî ya Bakurê Kurdistanê de cih girt.

Bi koçkirina têkoşerê Kurd Av. Ahmet Karli, tevgera bakurê Kurdistanê
xebatkarekî hêja û gelê Kurd ewladekî xwe yî bi rûmet wenda kir.

Bila serê gelê me, malbata wî û welatparêzên Kurdistanê sax be.


Hevgirtin-PDK
Komîteya Swêd

Weşanên Jîna Nû

- Ronahî (1942-1945) -Mîr Celadet Bedirxan
- Roja Nû (1943-1946)-Kamûran Alî Bedirxan
- Şeyh Sait Hareketi (1925 Büyük Kürt ayaklanması)-
Pof. M. A. Hasretyan. Dr. K. M. Ahmed, Mûrad Ciwan
- Lê Bireweriyekanim -Kerim Husamî
- Komara Demokrat a Kurdistan(Mahabad) -Kerim Husamî
- Dengê Xêzikan(Karikator)-Mamoste
- Tevgera Rewşenbîrî û siyasî ya Kurdan (dawiya 1800 destpêka
1900)- Dr. Celîlê Celîl
- Büyük Anayurt savaşı Kürtler- H. M. Çetoev
- Images du Kurdistan de Turquie- Şuayip Adlig
- Yüzyılımızın başlarında Kürt milliyetçiliği ve Dr. Abdullah
Cevdet- Malmîsanij
- Hêsir û Baran (çirok) -Bavê Nazê
- Zargotona Kurdên Sûriyê -Dr. Celîlê Celîl
- Agirê Sinema Amûdê - M. Ahmedê Namî
- Zazaca-Türkçe Sözlük -Malmîsanij
- Na Xumxum a...-Amadekar Koyo Berz
- Bir Kürtle konuşma(Şiir) -Adonîs Buduris
- Diwana Rûhî - Şêx Abdurrahmanê Axtepî
- Herakleitos(Şiir -Zazakî) -Malmîsanij
- Şairên Kurd ên Klasik- Abdulreşîb Yûsuf
- Li Kurdistanê Bakûr û Li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî- Malmîsanij
û M. Lewendî (cild: 1 û 2)
- Mîrsad-ul Etfal- Şêx Mihemed Kerbela
- İki Dünya Savaşı arasında Irak'ta Kürt sorunu -Prof. Dr. Şakirê Xudo
- Zimanê Min-Haydar Diljen
- Yeni Çağda ve son çağda Kürt Hareketi (kollektiv)
- Hünerên Tabloyên Şerefnamê - Abdulreşîb Yûsuf
- Türkçe açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi(Kurmanca lehçesi) Mûrad Ciwan
- Kurd û Kurdistan- Dr. Abdurrahman Qasimlo
- Folklor ma ra çend numûney- Malmîsanij
- 1980 Kürt Ayaklanması- Dr. Celîlê Celîl
- Mêr Mêra nasdike- (Karikator) Mamoste
- Tir di nivê kezebê de(Şiir)-Zekî Syda
- Bi xewna we pênuşê dilorinim- Ahmed Huseynî

Adresa Xwestinê
Box: 30
740 22 Belinge-Sweden

Tel: 8- 803135
Fax: 8- 801825



Hevalê hêja, têkoşerê Kurd
Av. Ahmed Karli

Di 7'ê Sibata 1994'an de
ji ber nexweşîya dil wefat kir.
Bila serê milletê Kurd û
malbata wî sax be.

YEKBÛN
(Partîya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê)
Komîteya Awrûpayê

DEP hilbijartinê..

ku li Kurdistanê ji DEP'ê re derkevin wek neteciya referandûmê bên nîşandan û dewletê di qada navnetewî de têxe tengasiyê. Loma jî li Kurdistanê hem li ser temamê gelê Kurd him li ser DEP'ê dest bi terorê kirin."

Herçiqas îro DEP di hin waran de şaşîyan dîke jî, li hember partiyên din di nav Kurdan de hîn potansiyeleke mezin heye ku piştigiriya wê dîke. Dewlet jî wê piştigiriya ditirse û jî bo ku DEP di

van hilbijartinan de zêde rey nestîne, dewlet bi her hawî li dijî wê şerekî psikolojîk dajo, avahiyên wan bombebaran dîke, namzetên wê yên belediya digre û tehdît û çavtirsandinê li wan dîke.

Berî ku rojnama me bikeve çapê DEP'ê qerar stend ku wê hilbijartinê boykot bikin. Piştî vê qerarê meriv meroq dîke gelo mebusên DEP'ê wê xwe ji Mecelisê jî vekşînin ya na?

Ji Nivîskarên...

Wexta rojnama me li ber çapê bû, kesên Platforma Demokratîk ya Diyarbekirê jî avêtin hefsê. Ew kes berpîrsiyarê rojnama Medya Guneşî yê Diyarbekirê Hamdullah Akyol, Serokê Sendika Genel-İş yê Diyarbekirê Mahmûd Alp-

aslana, Sekreterê Sendika Belediye-İş M. Tahîr Keskin û Serokê duyemîn yê Sendika Harb-İş M. Zulkuf Karakoc in. Polis êrîş bir ser buroyên Medya Guneşî yên Diyarbekirê û Adenê û gelek zerar daye wan.

Necmettin Buyukkaya di dilê...

rêzimana Lehça Zazakî û ferhengê Zazakî û Tirkî jî hat çapkirin. Ji ber ku anihî hinek derketine û dibejin ku Zaza ne Kurd in, ew xebata notên rojane dikare şikekê di derheqê Necmettîn de li ba hinekan peyda bike. Min ne carekê tenê, lê pir caran jî Necmettîn ev guhdar kirîye: *Tîrsa min ew e ku rojêkê hinek Zaza derkevin û bêjin Zaza ne Kurd in. Wê dijmin bi vê pir kêfxweş bibê. Ev ji bo me Kurdan zêrfiyek e û xeterê mezin e. Divê em di vê derheqê de pir şîyarbin.*

Girtin û şehîdbûna wî

Necmettîn buhara 1982'an li Diyarbekirê hat girtin. Nêzî du salan zindanî ma. Dema Necmettîn 41 salî bû, di nabêra rojên 22-24 Çileyay Paşin ya 1984'an de, di zindana Diyarbekir de bi awayekî ne mirovane hate kuştin. Roja kuştina wî ya eseh, hew qatîlên wî dizanin.

Necmettîn bi şoreşgerîya xwe, bi egîrî û fedek-

arîya xwe, bi zîrekî û dilovanîya xwe mirovek bû. Wek hemû mirovan ew jî xwediyê hinek "şaşîyan" bû. Lê dema ku sax bû, kar û xebata wî bersiva hemû bêbextî û neheqiyên ku lê dibûn dida. Lê piştî ku şehîd ket pirtûrîn tiştên baş ji bo wî hatin gotin. Lê neheqî û bêbextî jî lê hatin kirin. Min zûde dixwest ez bersiva gotineke ku ji bo wî hatibû gotin bidim.

Cemêrekî ku di eynî demê de di zindanê de bû û cesareta ku tev li serhildanan bibe nekiribû, piştî ku derket ji bo ku xwe wek mirovekî jîr ku karibû jîyana xwe xelaske bide nasîn, gotibû ku *Necmettîn ji ber "kapsîsên" xwe yên serokatîyê hate kuştin.* Lê aqildarê jîr, ji ber fedîbûna "kirinên" xwe, ya jî nekirinên xwe ji bir dikir ku ferqe peyva "kapsîs" û berpîrsiyarîya li hemû deran û di hemû rewşan de diyarbirina cesaretê şoreşgerî û helwesteke bi rûmet heye. Bê guman ger ku Necmettîn li emirên ne-

Kampa...

Di bomberanan de nêzî 150 bombe hatin bi kar anîn. Di diroka Komara Tirkîyê de ev cara pêşîn e ku dewleta Tirk êrîşeke wiha ji "hudûdên" xwe 110 km dûrtir, pêk tîne. Li gor berpîrsiyarên hukûmeta Tirkîyê, di bombebaranên de gelek ziyar hatiya daîn û nêzî 200 gerillayên PKK'ê jî hatine kuştin. Lê PKK vê îddîaya dewletê pûç derdixê û dibêje "me berê zanibû ku wê dewleta Tirkîyê kampa Zelê bombebaran bike, ji bo wê jî me kampê terk kiribû û jî ber veyekê jî zahiya me nîne." Lê tiştê resmî yê ku heta nuha hatine belav kirin ew e ku jî gundekî Kurdistanê Îranê ku 3 km nêzî kampa Zelê ye 9 kesên sîvîl hatine kuştin û 19 kes jî birîndar bûne.

Ji bo veyekê di navbera Îran û Tirkîyê de di varê dîplomasiyê de problem derxistin û dewleta Tirk wê tazminat bide Îranê.

Wexta balafirên şer yê Tirkîyê li kampa Zelê dixistin tankên Tirkîyê jî diketin hundirê sînorê Kurdistanê Iraqê.

Destdane ser arşiv û kitêba M. Alî Ural ya bi navê "Sorgu zindan Dîreniş ve yaşam" Berpîrsiyarê Giştî yê Medya Guneşî Mahmûd Metîn bi beyanekê van êrîşan protesto kir

mirovan guhdar kiribaya, dema xortên 20 salî diwarên zindanê dihejandin ew bi xwe bê deng bimaya, nedihat kuştin.

Hinekan jî bi aqil û nê-tên tucaran gotin ku hevalên wî yê kevn ji bo wî tiştê nekirin. Berî hemû tiştan divê ez bêjim ku em ne hevalên wî yê kevn in, em hevalên wî yê her demê ne. Tiştê mezintirîn ku mirov karibe ji bo wî bike, ew e ku mirov ji bo serketina armanca ku wî bi salan ji bo kar kir û jî bo şehîd ket, kar û xebatê bike û bike ku ked û xwîna wî û a bi hezaran şehîdan din bi avê de nere.

Necmettîn sala 1975'an bi destgirtîya xwe ya salên dibistanê Cemile re zewicî. Du keçên wan, Serdil û Alîya hene.

Îro piştî deh salîya şehîdketina Necmettîn, bi giramîyeke mezin wî bi bîr ûnîm. Necmettîn bi şev û rojan di dilê me û bi hezaran Kurdên din de dijî.

Kultur û Polîtîka

Riza Polat

Marifet ew e ku mirov ji kîsî xwe bifikire

Rexne kirin marifetê dixwaze. Ji bo ku mirov fikrekê yan jî berhemekê binirxîne, pêwîst e berî her tiştî serê mirov ronî be, nuxte û ferqiyetên ku mirov dixwaze ifade bike, bikaribe baş bîne ziman da ku mirov li dijî çî ye û bi çî riyê bê fêmkirin. Di hejmara Armancê a 144'an de bi navê "Çend Gotin li Ser İdris Bülîsî û Drama Kurdan" nivîseke Yaşar Abdulselamoglu hat weşandin. Abdulselamoglu di nivîsa xwe de, dixwaze "çend şaşitiyên" min nîşanî xwendevanan bide. Lê di nivîsa wî de hinek tişt baş nayên fêmkirin, ku ew bi çî metodî li çî rexne digre ne xuya ye. Wek minak, Ebdulselamoglu rexne li nivî-seke min ya ku di derheqê dîrok-nivîsînê digre, lê di nivîsa wî de, qismê di derheqê dîroknivîsînê de, dijayetiya hewokekê bi fikrên min re tune ye. Lewra nayê fêmkirin ku, ew rexne li nivîsa min digre yan jî li dîrok nivîsandina Kurda digre.. "di nivîsareke xwe de R.Polat rexne li kesên ku li ser dîrokê dixebitin digre, xebatên li ser dîrokê weha nabe dibêje" 'Nivîsarên Kurdî çî edebî, çî ilmî, çî dîrok bin li gor standartên unîversal nekemilîne.' "dîrok jî weke hemû rengên zanistiyê ciddiyetê dixwaze." "Em dizanin ku di nav Kurdan de dîrokanî pêş neketiye"

Goya Ebdulselamoglu bi wan hevo-kên jorî xwe xwestiyar rexne li van dîtinên min bigre; "Di nivîsandina dîroka Kurdan de gelek valahî û alozî hene û nivîsînên tarix û zanistiyê dîrokî sathî ye û çîrokî ye." "Çunkî dema ku mirov li standart û kirîterên dîrokê, dîroknasiyê û dîroknivîsînê îro dinêre, mirov dibîne ku di wî warî de Kurdan hê jî di nivîsandina dîrokê de girên biçûk jî dirûst nekirine." Wek min li jor jî ifade kiriye, baş nayê fêmkirin ku nuxtên cihê çî ne, Ebdulselamoglu dixwaze çî rexne bike û derdê wî çî ye.

Ebdulselamoglu li ser şiklê avabûna civaka Kurdan analîzên "sosyolojîk" û "ilmî" dike, di wî warî de, gotin û navên ku min "şaş" bi kar anîne rast dike. Ew dixwaze bide xuyakirin ku gotina axa û reiseşîr pirr ji hev cihê ne û ne eynî tiştin. Lê ji bo Kurdekî ku bi Kurdî bizanibe û civaka Kurda nasbike, tesbîten Ebdulselamoglu yê "ilmî" pirr pêkenokî ne û bê mane ne. "R.Polat dibêje.. 'Di 1511' da Şah İsmail gazî nêzikî 25 axa û serokeşîrên Kurdan dike(...) Lê Şerefxanê Bedlîsî û çend axayên din bernade." "ya din divê R.Polat gotinên 'axa' 'Serokeşîr' û gotinên 'mîr' û 'xan' ji hev cihê bike. Naveroka cîvakî, siyasî ya wan gotinan ji hev cihê ye." Bê şik her gotinek tiştêkî ifade dike. Gotin yan jî nav kirin, gava di cî de neyên bikaranîn, di îzahkirinê de alozî û zehmetî çêdikin. Ev yek di her ilmî de wisa ye. Gava mirov gotinekê yan jî navkirinekê bîne ziman, li pêş çavê mirov tabloyek û şeklek rûdide. Lê diyar e ku Ebdulselamoglu bîyî ku maneya hinek gotinan fêmkirî bike rexne li min girtiye. Min minakeke di salên 1500'î de da ye. Heger mirov avabûna civaka Kurdan a wê demê bîne pêşberî çavan yê fêmkirina hinek tiştan hêsantir be. Carekê, Kurdan di dîroka xwe de pirr kêman caran dewlet avakirine. Ji ber wê jî, piraniya gotinên siyasî, eskerî û îdarî yê Kurdan, di dema borî de bi-

karanîne bi zimanên cîranên wan bûne. Piraniya wan gotinan ji Erebi, Tirkî û Farisî ketine zimanê Kurdî. Wek mîsal Emîr gotineke Erebi ye û maneya wê reiseşîr eşiretekê, herêmekê yan jî reiseşîr qewmekê ye. Li Kurdistanê pirr kêman axa yan jî mîr hebûn ku di eynî wextê de ne serokê eşiretekê bûn.

Li gel wê jî, her Kurdekî ku civaka Kurda nas kiribe, yê bizanibe ku Kurd jî bo her serokekî eşiretekê gotina axa jî bi kar tînin. Minak di wî warî de pirr in. Heta sedsala 20'an jî gotina Axax û Serokeşîr di eynî maneyê de dihat bi karanîn. Lê piştî pêşketina kapitalîzmê, li Kurdistanê zenginên erdê çêbûn û Kurda jî bo wan jî gotina axa bi karanîn.

Ebdulselamoglu jî bo tesbîten xwe yê "ilmî" Şerefxanê Bedlîsî dike. Ji bo ku nebêje eşîra Şerefxan heye wiha dibêje, "Şerefxan Bedlîsî di 'Şerefxanê' de dinivîsîne ku, piştî, xwedîyên Emîr Şerefxanê bi çî awayî û bi şiklê derwêş, wî direvînin". Her kesekî ku Şerefxanê xwendibe, dizane ku Emîr Şerefxan di eynî wextê de reiseşîr eşîreta Rojî ye û dema ew di destê Şah İsmail de girtiye, eşîreta wî; eşîreta Rojîyan wî rizgar dike.

Nuxteke din a ku Ebdulselamoglu rexne li min digre, ew jî ji bona ku min gotiye navê bapîrê nivîskarê Şerefxanê Şerefxanê Bedlîsî ye. Min behsa hevalbendiyekê kiriye û jê encam derxistine. Ebdulselamoglu bîyî ku rastîya wê hevalbendiyê û encamên ku min jê derxistine munaqeshe bike, li ser "şaşitiya" navê Şerefxanê dike. Li gel wê jî, ji bo ku mirov şaşitiyêke faktayî bide xuya kirin, pêwîst e ku mirov delil û çavkanîyan nîşan bide. Ne rast e mirov wiha jiber xwe ve bibêje, "Xwiya ye R.Polat, wusa bê çavkanî, Hevalbendîya Şerefxanê Bedlîsî bi Yavuz Sultan Selim re şirove dike".

Tiştê ku mirov jî Ebdulselamoglu fêmkirî dike, wî tenê navê Şerefxanê û nivîskarê wê di nusxa Tirkî de a ku M. E. Bozarslan wergerandiye de dîtîye. Navê nivîskarê Şerefxanê di ferhengên Osmanîya de Şerefxanê Bedlîsî ibn Şemseddin Bidlîsî û li ser rûyê Şerefxanê (nusxa ku cara yekemîn li Petersburgê di salên 1860-62 de çap buye) de jî Şerefxanê Bedlîsî ye (Cherefxanê ou Fastes de la nation Kourde par Chêrefou'ddine, Prince de Bidlis. Traduits du Persan et commentés par François Bernard Charmoy, 4 Bde. St. Petersburg 1868-1878, binêre: Wilhelm Köhler Di Seyahatnameyên Ewliya Çelebî De Bidlîs û Gelê wê, Ist. 1989)

Dema mirov li wan çavkanîyan dinêre, mirov dibîne ku navê nivîskarê Şerefxanê Şerefxanê e, navê bavê wî Şemseddin Bedlîsî û navê kalikê wî jî Şerefxan e. Wekî tê zanîn berê li dîyarê mirov bi navê bajarê xwe jî xerîbîyê dihat bi nav kirin. İro li Sûryê û Urînê pirr Kurd hene ku bi navê bajarê xwe tên nas kirin. Wek Nûrî Dêrsimî, İsmet Şerîf Wanlî. Vêca gava paşnavê bav û yê kur jî Bedlîsî be, çîma kalikê wan ne ji eynî herêma ye?

Lê xuya ye ku mirov jî kîsî xwe ne fikire û jî kîsî hinek kesên din biaxive, mirov yê fêmkirî neke ku mirov li dijî çî ye û bi çî re ye û ev jî ne raste ku mirov bi gotinên hinek kesan, rexne li hinekên din bigire.

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Hevalêng hêngja!

Ev nameya jêrîn do êvarê ji me re ji Çînê hat. Di vê sedsala 20'an de bi xêra poste û telefonan, êdî mirov dizane ku li kuderê Kurd hene. Hûn bi xwe jî dê bixwînin daku li Çînê jî Kurd hene. Zimanê nameyê me negubert, her wekî xwe ye; yanê bi Kurmancîya Çînê ye.

Hevalêng hêngja!

Emg li vêng dergê ne gelekîng. Li gorg nifûngsa Çîngê emg eng-qelîyeteke pîrg piçûng têng qengbûlg kîring. Çîmkîng emg tenêng heftêng (70) milyongîng.

Mîngîngqa ku emg lêng dijîng, jêng re dibêjîng "Çiyayêng Xû-nang".

Çeng rongî berêng me jî cejnga Newrozîngê pîrozîng kîrg. Dengbêjîngê me yê bi naving û deng Şîng-Vang bi dengê xwe yê xweşîng û tengbûringa xwe ya ringding sitranêng gelêring û folklorîng pêşkêşî me Kurdêng Çîngê kîrg. Hongzang Şîng-Vang di dawîngê de sitranga mengşûr Kîngê Emg gotg û şev-aheng xelas bûng.

Her wengha li vêng dergê me jî Engstîngtûnga Kurdîng a Çîngê vekîng. Hûng dikarîng hemû kovarîng û kitabîng û belavokêng xwe bişîngîng ser navnîşanga Engstîngtûngê.

Ji bo hejmarînga dînga kovarînga we, emgê jî weng re gotarîngêkê li ser du nivîskarîngêng me yêng mezing Mahn-Mungt Bang-Sîng û Meng-Metg Ung-Zîng binivîsîng ku kitabêng wangêng vê dawîngê li vêng dergê bi zimangê Çîngî jî derketîng.

De heta mektûbînga dîng, bimîngîng di xweşîngê de.

Bi silavîngên birangîyê!

Birangê we Şong-Reş Wang Yû Çîng

Çend pêkenî ji Rêber Seîd

Ez dew çê dikim
Zilamekî tasek tijî mast
xwar û tasek av jî bi ser de
vexwar û rabû ser piya xwe
hejand. Hevalên wî jê
pirsîn "çîma wîlo dikî?".
Got:

-Ez dew çê dikim!

Sê Mirîşk

Yekî jî yekî Torî pîrsî:
-Heke te zanî çend
mirîşk di vî kîsikî de hene
ezê her sêyan bidim te!
Yê Torî:
-Eeee, ezê ji ku bizanî-
bim lawo, ma qey ez şêx
im!



ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

* Di teknîka hesirê de rekorên nûh tên holê. Japonî bi Tirêna xwe ya bi navê Star 21 (Stêrk21) di seetekê de 403 Km rê çû. Ev jî bo Japoniya rekor bû. Lê Tirêna Fransîzî di seetekê de 503 Km rê çû û rekorê nû şikand. Tirêna Swêdî X 2000 di seetekê de 276 Km. rê diçe. Ferqa Tirêna Swêdî û yê din ew e ku Tirêna Swêdî di rîya hesin ya adetî de diçe.

* Ma stêrk tenê tirêjên ronahiyê dişînin? Na, li gor lêkolînên astronom û fizîkzanan stêrk ne tenê tirêjên ronahiyê, lê maddeyên radyoaktîv jî dişînin.

* Heywanên bi jahî bi piranî li navça û başurê Amerika li rojava û merkeza Afrika rojhilata başurê Asya, Endonezya û Avustralyayê ne. Li van cîyan cîns û cûrên heywanan pirin. Dema

cîns û cûrên heywanan pir in. Dema cîns û cûrên heywanan pir dibin hejmara heywanên bi jahî jî zêde dibin. Ji ber ku cîns û cûrên heywanan pir in reqabeta di navbera heywanan de jî pir dibe. Ji ber wê yekê yê ku heywan hemû teknîk bikar tînin ku ji yana xwe biweşînin. Bi jahî bûn yek jî wan teknîka ye û jî loma jî heywanên bi jahî jî li welatên jor pir tirin.

* Li dinê transplantasyona poz (bêvil) cara yekem li Hindistanê B.Z.İ. 750 'î de hat çêkirin. Poz jî qehpîkan dihat stendîne.

* 37 hejmarekî taybetî ye. Ew tenê bi xe ve tê parvekirin lê bi hejmarên 111,222,333,444,555,666,777,888,999 re dût derdikeve.

* Japonî li dinê eynika herî mezin a telekopê çê dikin. Eynîk 35 ton giran e û çapa xwe jî 8 m. ye.

* Amerîkî dataya (computer) ku ji axaftinê fêmkirî çêkirine. Mirov nivîsê jî mikrofonê datayê re dixwîne. Data dengên diguhêzîne sinyalên (îşaret) dijital û piştê diguhêzîne nivîsê. Data niha tenê bi İngîlîzî fêmkirî dike.